# Hêlîn

MAHMUT BAKSI



ROMAN

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
*Bibliothèque*
Reçu le 05/05/2021

Liv. 7751

OFFERT
PAR
JOYCE BLAU

Institut kurde de Paris

Mahmut Baksi

# HELIN

—roman—

Institut kurde de Paris

Ev pirtok sıftê bı swêdi hate çapkırın.

Institut kurde de Paris

Invandrarförlaget

Institut kurde de Paris

IMMIGRANT-INSTITUTET
Ser. D. Barn- och läroböcker.
Nr 15. Helin / Mahmut Baksi

Institut kurde de Paris

© 1984, Mahmut Baksi

INVANDRARFÖRLAGET
Kvarngatan 16
S-502 44 BORÅS, SWEDEN
Sättning : Kurdiska kulturförlaget / 1984

ISBN 91-85242-86-1
ISSN 0349-8417

Pirtokên Mahmut Baksi

Bi kurdi:

Zarokên İhsan ..................................1978
Keça Kurd Zozan ..............................1979
Hêlin ..............................................1984

Bı tırki:

Mezra Botan .....................................1968
Şadi Alkılıç davası ...........................1969
Vatandaş Hakkı ................................1970
Kürt sorunu ......................................1971
Kürt tarihi ........................................1972
İsveç İsveç dedikleri ..........................1976
Kamışli katliamı ...............................1981

Bı swêdi:

Den kurdiska frågan ..........................1974
Små slavar ........................................1975
Hörru du ...........................................1976
Ihsans barn .......................................1977
Zozan ...............................................1978
Hasan aga .........................................1979
Kurdistan ..........................................1980
Hanna ...............................................1981
Helin ................................................1983

Bi danimarki:

Ihsans born .......................................1979
Zozan ...............................................1980
Hasan aga .........................................1981

Bi norweci:

Små slaver ........................................1977
Zozan ...............................................1980

Institut kurde de Paris



Ji bo bîranîna xwişka min a Necla Baksi ku di, 12.12.1980' de, bi destê Ordîya Tirkan li bajarê Qamîşloyê, tevî çardeh hevalên xwe ve hat kuştin.

Mahmut Baksi

Institut kurde de Paris

# HÊLÎNEK

Teyra Basbelek wek brûskê xwe ji serê Sipanê Xelatê berda jêr. Perr û baskên wê ruyê esmên qelaşt. Gul û sosin, nêrgiz û rihan, ji bayê baskên wê serhev de ketin. Nefel û giya bînekе xweş xistin dilê Sipanê. Sipan fûriya...

Teyra Basbelek bi lez û bez xwe dirêjê Gola Wanê kir, li hawirdora golê geriya. Gola Wanê ji heybeta perrên wê leqiya, kef da. Pêlan xwe li qerexê Çiyayê Sipanê dan û ketin naziya... Teyra Basbelek bi kêfa dilê xwe firiya, çû hat. Çavên xwe berda nava golê û sekinî. Roj di dilê golê de teqiya. Ev gol ji hezaran sala vir de gola wê bû. Bi dil û can, bi eşq û evînî, bi golê re kete laqirdiyan. Porê xwe şûşt, biskên xwe xemiland, hesreta dilê xwe ji golê re got. Paşî berê xwe da Sipanê û firiya. Bilind bû. Sipan di bin de ma. Teyra Basbelek li hawirdora Sipanê çerixî. Pezkoviyan dît. Li xezalan mêze kir, rastê refên kewa hat. Dengê qulingan kete gohên wê...

Ber evarê Teyra Basbelek qerarê xwe da. Belê ewê hêlına xwe li serê dareke bilind û geş çêkira. Ev dar cinarê Xecê û Siyabend bû. Ev dar dara evînê bû...

Bi rojan teyra Basbelek xebitî. Bi şev û roj nesekinî. Ji xwe re hêlînekê xweşik û nerm çê-

Institut Kurde de Paris

kir. Piştî çend rojan hêlîna xwe bi çar hêkên delal xemiland, li ser hêkên xwe rûnişt û sekinî. Carna mêrê wê dihat balê, alikari dikir, jêre xwarin tanî.

Piştê çand heftan hêk di binde leqiyan. Çar zarokên piçûk serê xwe derxistin û giriyan. Bu çike çika wan û qariyan. Teyra Basbelek perrên xwe kir siwan, wan xiste dilê xwe, bi evînî li wan mêze kir û keniya...

Zarok zû firoke bûn. Carna bi dê û bavê xwe re diçûn nêçirê û difiriyan. Roj bi roj hînê jiyanê dibûn û digeriyan.

Lê rojek, rojekê havinî, gurmînek bi serê Sipanê ket. Sîpan hêjiya, Sîpan giriya, Sîpan teqiya. Newal û zinar deng dan. Gola Wanê vereşiya.. Neçirwaneke zalim û bêbav berê tivinga xwe dabû dilê hêlîna Teyra Basbelek... Gurmmm gurmmmm... Henek zarok bê can ketin binê darê. Perr û baskên wan şikestin... Yên sax man bi çaralî reviyan...

Neçîrvan hêlîna wan xira kiribû...

Xecê û siyabend di nav gora xwe de dinaliyan...

Mahmut Baksi Stockholm/1984

# EZ ÇAWA HATİM DİNÊ ?

Ez ji we re çawa bêjim. Ez pirr qels im. Bejna min zirav e wek tayikê. Bi pifeki ez dileqim, dihejim, difirim. Piça goşt para min neketiye. Ranên min çerm û hestî ne. Çawa ku meriv derpêkî li maşekî bike, ez jı wilo me. Parsuyên min yek bi yek tên jimartin. Qorikên min wek hêkên çivîkan di nav derpiyê min de li hev dikevin. Pirr caran derpiyê min ji min dişeqite, dikeve nav lingên min. Destê min tim bi derpiyê min ve girêdayî ye.

Lê ez pirr zîrek im. Ji aliyê zanebûnê ez ji hevalên xwe ne kêmtir im. Şika min ji hişê min tune ye. Ez jî difikirim, dikenim dipeyîvim. Lê dadê û bavo bi çavekî piçûk li min mêze dikin. Ji wan kiri ez tiştek nizanim û pirr saf im. Ew min li gora bejna min dipîvin. Ji bo vê yekê gelek caran şaşiyê mezin dikin. Mesela gava dilê wan bi hev şabûnê dixwaze, bavo eşkere ji dadê re dibêje û diçin dikevin nav ciya. Ji wan kiri ez bi van tiştan nizanim û fêm nakim. Lê bi rastı ew xwe dixapînin. Pîrika min digot: " Aqil ne di sala de ye, aqil dî serî de ye."

Baş e, bi bîr û baweriya we, ez çima hew qas jar im ? Ma ez têr xwarin naxwim ? An jî di mala me de tiştê me yên xwarinê tune ? Bi rasti mala me her dem tijî ye. Hûn çi bixwazin di mala me de heye. Bavo di vî ali de pirr baş e û dilsoz e. Tu car

Institut kurde de Paris

malê vala nahêle. Û ez ji sibê heya êvarê tişta dixwim û vedixwim. Heta beriya ku ezê razêm jî disa hinek tişta davêjim devê xwe û di xew re diçim. Erçena min tim dixebite, wek aş...

Lê disa jî ez qels im, hesti û çerm im. Çima gelo ? Piştî hewqas xwarin û vexwarinê ez çima wusa me ? Ma Xwedê ji min standiye, çi ye ? Bê guman ev tişt ne bê sedem e.

Ez dizanim, pirraniya we ketiye meraqa min û hun dixwazin ku ez ji we re sedema vê tiştê pêre pêre bêjim. Hay hay... Serseran, serçavan. Ez ji naxwazim hun di meraqa min de bimînin. Ezê vêga ji we re rastiyê bêjim. Ez wusa bawer im ku hunê heq bidine min û alikariya min bikin...

Şeva ku bavo û dadê bi hevre peyivîn, ji bo zarokan çêkin, dadê hijde, bavo bist salî bû. Gava ku peyva wan qediya, bavo wê şevê zikê dadê tijî kir. Ava bavo û hêka dadê di nav zikê dadê de gihiştine hev. Roj bi roj zikê dadê mezin bû, pifiya, werimî. Tu kes, ne bavo, ne jî dadê zanibû, ku bavo du tov xistibû zikê dadê. Dadê bi cêwik bû, lê, gumana wê ji vî tiştî tune bû.

Ez û brayê xwe di zikê dadê da mezin dibûn. Brayê min tim li min Neheqi dikir û pihîna li min dixist. Nedihişt ku ez xwarin bixwim. Çi dihat, davêt devê xwe. Dikir nedikir têr nedibû. Carna ku ji berê bima dida min. Ji bo vê yekê brayê min ji min zeximtir û girtir bû. " Ez kur im, ez mêr im " digot. " Tu keç î, ez çi bêjim gere tu wekî min bikî... " Pirrê cara li min dixist. Me bi şimaqan hevdu diperitand. Lê ez pê nikaribûm. Brayê min bû-

Institut kurde de Paris

bû wek golikê çolê. Şerê me, diya me zaf dêşand. Zikê wê bel dibû, ciyê pihinên me ji derve dihat xwuya kirin...

Brayê min roj bi roj mezin dibû, qelew dibû. Bi kêmani du car li min hebû. Di nav zikê dadê de hema hema ji min re cî nema bû. Rojê belkı deh caran li min dixist, gohê min dikşand, qunciriîka li min dida. Min qêrînî dikir, hawar dikir, lê tu kes bi dengê min nedihisiya. Hawareke bê bersiv, hawareke beredayi bû...

Rojekî gava brayê min ketibû xewê, min qerar da ku ji zikê dadê derkevim. Bes e. Ez êdi nikarim zêde derdê brayê xwe bikşînim. Ez jê pirr ditirsiyam. A bixêr ew e ku em ji hevdû biqetin. Min xwe di zikê dadê de qeliband, serê xwe berjêrê nav lingê dadê kir. Ji nişka ve brayê min şiyar bû û bi qevdika piyê min girt û para kişand. Min wî da ber pehîna, ber zîtika. Lê feyde nekir. Wî dafek li min da û xwe berjêrî nav linge dadê kir û herikî, çû... Di nav çend deqan de wenda bû, qîrîniya wî ji derve dihat. Şerê min û brayê min êşekê pirr mezin û hişk dabû dadê. Qîjînî jê diçû. Gavên wê vekirî bûn. Dadê dixwest ku çi di zikê wê de hebe bavêje derve...

Li ber lingên dadê dengên jinan dihat. Di zikê dadê de ez tenê mabûm. Bi rastî ez pirr dêşiyam, kela min rabû bû. Çima wan jinan pêşî bi serê brayê min girtin û kişandin, ne yê min ? Bo ku ew kur bû, ha ? Madem wusa ye, ez jî dernakevim. Ezê di zikê dadê de bimînim. Piştî brayê min, zikê dadê vala bûbû. Ez êdî bi kêfa xwe dikaribûm

Institut kurde de Paris

bilepitîma. Min xwe kişand jorê, ku tu dest negihîje min. Min haziriya xwe û xewê dikir, ji nişka ve dengê pîrika min kete gohên min.

- Were derve, pîrika min got.

- Ez nayêm, min gote pîrika xwe. Hun bimrin jî, biteqin jî ez nayêm.

- Keçê pepûkê, rebenê derkeve were dibêjime te. Ezê şekirê qulo qulo, şekirê sor û zer bidim te. Tu ji min bawer naki, hema hinek serê xwe derxe û mêze ke.

- Ez nayêm min ji te re got. Min sond xwariye ez ji zikê dadê dernayêm. Dev ji min berde û here. Tu doza çi li min diki...

- Ku tu neyî wê diya te bimire, pîrika min got. Zû ke were.

Ez fikirîm... Sêwîtîyê ez tirsandim. Zarokên sêwî, xasma en bê dê, karin çi bikin. Lê ne rast e. Pîrika min dixwaze min bixapîne. Ev hewqas meh e, em di zikê dadê de bûn, çima dadê nemir ? Karûbarê mezinan tim xapandin e...

- Tu min dixapînî, min gote pîrika xwe. Ez ne yê xapandinê me. Min carek qerar daye, ez ji zikê dadê dernakevim.

Zikê dadê germ û xweş bû. Kulpina dilê dadê dihat min. Ez ji bela brayê xwe jî xelas bûbûm. Çi biketa zikê dadê yê min bû. Ma ezê çima derkevim. Wele ew biteqin jî ez dernakevim û naçim ba wan.

Ji nedîtî ve dengê zirnê û defê hate min. Deng ji derve dihat. Dengekî pirr xweş û geş bû. Ez di zikê dadê da rabûm govendê. Pîrika min dixwest ku ez

Institut kurde de Paris

bi dengê zirnê bixapim û serê xwe derxim. Lê ez nehatim leyisteka wê. Min têr û sertêra xwe govend girt û ketim xewê.

Dinavberê de qederek wext derbaz bû. Dengê def û zirnê sekinî bû. Bêdengbûnê ez tirsandim. Pîrika min, jinên dinê bi ku de çû bûn ? Dibe ku ji min xeyidî bin. Qey min wan pirr êşand gelo ? Meraqa min zêde bû, tirs kete dilê min. Min xwe qilopani kir û ber bi lingên dadê da çûm. Min dixwest derve qontrol bikim, ka çi heye, çi tuneye. Hêdi hêdi min serê xwe di nav lingên dadê de derxist. Bi derxistinê re, pîrika min bi serê min girt û kişand. Min avête nava teşta avê. Ez di nav avê de gevizîm, perpitîm, min pê û destên xwe li avê da. Av rijiya, pîrika min şil bû. Min dixwest dîsa biçim zikê dadê. Lê pîrika min nehişt. Min xiste paçuçkê, dest û lingên min girê da û min danî ber çiçikên diya min. Çiçikên dadê jî wek zikê dadê xweşik û germ bû. Ez lê mijiyam. Şîrê dadê pirr xweş bû...

Institut kurde de Paris

## AZAD

Navê brayê min danîn Azad. Navekî delal û mêrxas. Azad wek navê xwe, ewê jiyana xwe bidomîne. Ew kur e. Jê re hertişt serbest e. Li gora dilê xwe wê bikaribe hereket bike. Ciyê kuran bilind e, girîng e li Kurdistanê. Diyên ku kur tînin pirr bi rumet in, nazik in, tên hes kirin. Tu kes nikare têkilî wan bibe.

Azad wek navê xwe mezin dibû. Dê û bavê min ji sibê heya êvarê li pey Azad bûn. Azad dîn îmanê wan bû. Daxwaza wî pêre pêre dihat cî. Her roj li min dixist, çêrê dadê dikir, serê zarokan dişikand. Lê dîsa jı bavo jê re tiştek nedigot. Azad bûbû beranê malê, beranê nav kêriyê. Xwediyê hertiştî bû. Azad zaf kubar bûbû. Carna Azad mexsûs xwe nexweş dixist û diket nav livîna. Bi derewî dibû nalîna wî. Dadê û bavo karûbarên xwe berdidan û li balê rûdiniştin. Jê re porteqalan, sêvan, şekiran dikirîn û didan devê wî. Azad bi hezar naziyan wan dixwar. Carna jî destê bavo gez dikir û diqîrîya. Dadê jê re xwarinên bi dilê wî çêdikir. Bavo pê kenokan digot, ew dida kenandin. Di van deman de Azad xwe di nav ciya de pîj dikir, sêv û porteqalên xwe dixwar, qalikên wan jî davêt ber min.

Lê ez ? Ji bo ku ez keçik bûm, navê min danîn Hêlîn. Ezê jî li gora navê xwe mezin bibûma. Keç stûxwarin li Kurdistanê. Keç ne tiştek in bi bîrûba-

weriya mezinan. Diyên ku keç tînin pirr tadeyi dikşînin. Zaf caran mêrên wan jin tînin ser wan. Yani dibin xwedi hewî. Halbûki gunehê jinan di vî tiştî de tuneye. Keç an jî kur bi temamî girêdayê bava ne. Bav çi bêxin zikê dada, ew derdikevin. Lê tu bav naxwaze vê rastiyê qebûl bike. Jinên reben tim vî derdî dikşînin, tên perçiqandin. Bi rasti mezinên me pirr ecêb in... Qet nafikirin. Ma ku keç tune bin, ewê kî kuran bîne ? Kî hewqas kuran anî dinê ? Bavo, mamên min çawan çêbûn ? Lê bav ji van pirsan hes nakin û ditirsin. Em newêrin li ber wan devê xwe vekin. Em keç in, hewqas xeber... Zêde peyvandin ji me re ne baş e.

Belê, navê min danın Hêlın. Ezê jî wek çivîkan li ser hêlîna xwe runêm, zarokan çêkim, li wan mêze kim, guyê wan paqij kim. U ezê tu car bi dilê xwe nikaribim zewacê bikim. Ev tişt karê bavo ye, ev tişt heqê pismama ye. Şûştina cil û firaqan, pijandina xwarinê, karûbarên malê ewê tim li min be. Halbûki ez û brayê xwe ji yek zikî derketin. Bavê me yek, diya me yek, lê qedera me ne yek e. Ez xwişk im ew bra ye. Çavê felekê kor be...

Erê, çavê felekê hezar car kor be. Gava ku ez nexweş dikevim, kes pênç quruşê xwe bi min nade. Havîn û zivistan kincên min wekhev in. Kes ji min hes nake. Mezinên me tinazê xwe bi min dikin. Carna ruyê min diquncirînin. Dixwazin zanibin ka ez piçek qelew bûme an na. Ciyê tilîkên wan di ruyê min de dimîne û ez pirr dêşim. Ji bo vê yekê gava ez mezinan dibînim, pêre pêre baz didim û direvim...

Institut kurde de Paris

# BAVO

Bavê min mamoste ye. Gava bavo bi gundiyan re dipeyive tiştên pirr grîng û baş dibêje. Gundî bi dil û can gohên xwe didin bavo. Bavo ji heftiyê carek wan li dibistanê kom dike û ders dide wan. Bavo ji wan re dibêje, dîvê meriv li zarokên xwe nexe. Lêxistina zarokan tişteke zaf şerm e. Li gora peyvên bavo di navbera keç û kuran de tu ferq tune ye. Herdû jî wek hev in. Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e... Lê bavo van şîretan tenê li gundiyan dike. Ev tiştên ku bavo dîbêje, bavo pê ne bawer e. Rewşa min li meydanê ye. Ger ev tiştên ku bavo ji gundiyan re dibêje, bi xwe bikira ewê halê min ne wulo bûya. Heta îro kesî nedîtiye ku bavo bi min re peyiviye. Her roj nebe jî di hefteyek de bi kêmani sê-çar car li min dixe. Bavo qet naxwaze li nava çavên min mêze bike. Çavên xwe tim ji çavên min direvîne... Gava em laqê hevdû tên riya xwe digohirîne, madûmirûsê xwe dike.

Rewşa min ev e. Jiyana min ne tu jiyan e. Xwezî ez dîsa di zikê dadê de bûma. Lê tişt bi xweziyê çênabin. Daxwaza dilê meriv zû bi zû nayê cî.

Sal zû derbas bûn. Azad sal bi sal girtir bû. Pirr caran bi min re nedilîst û xwe li min danetanî. Bibaweriya wî ez keçkekê evdal, nexweşokî û pepûk bûm. Çi bihata devê wî ji min re digot. Min jê nefret dikir. Gava ku fersend biketa destê min, min wî

Institut kurde de Paris

dida ber quncirîka û direviyam. Ew çaxê qîrînî jê diçû wek lawuran. Ji erdê kevir radikir û dida pey min. Lê ez ji revê re baş bûm. Wek kivroşkan dipekiyam. Di revê de kes nikaribû bigihîşta min. Min lêdana xwe li mal dixwar...

Zarokên gundiya zaf caran bela xwe li min didan. Ez bûbûm listokê wan. Roj bê girîn, bê şer derbas nedibûn. Gundiya navê min danibûn " Qîjqîjokê... "

Bavo li ser Azad çend helbestan nivîsî bû. Zarokên gund van helbestan jiber kiribûn. Gundiya Azad didan ser milên xwe û dinav gund de digerandin. Bi rasti ez jê pirr dihesidîm. Hesûd bûneke mezin û tarî bû... Lê mizinên me tênedigihiştin ku zarok ji hev pirr dihesidin û nefreta wan zêde dibe.

Carna ez ji malê direviyam. Dûr, pirr dûr diçûm. Bi seetan li çolê dimam. Min hêvi dikir ku dê û bavê min bikevin meraqa min û li min bigerin. Lê xweziya min di dilê min de dima. Ez li çolê têr û sertêra xwe ji xwe re digeriyam û difetilim malê. Haya tu kesî ji min tune bû. Ez wek sı bûm. Herkes pêl min dikir û derbaz dibû...

Rojek ji nav rojan çaxê ez serê sîbekî şiyar bûm, dengê zirnê û defê kete gohên min. Dengekî xweş û dilşa bû. Dîlê min reqisî, ruyê min keniya. Min tu car xwe wusa bi kêf nedî bû.

Li ber devê deriyê me bi dehan; zarok, jin, mêr, xort û keç ketîbûn govendê. Repîna wan bû dileyistin. Xortan xwe diricifand, dihejand. Işlikên wan ên naylonî di xwidanê de mabûn. Sergovend kefiya sor dihejand û govendê radikir. Keçên xama

Institut kurde de Paris

kincên heft reng li xwe kiribûn û bi serê çavan xortan dipalandin, diniqandin. Di dilên xwe de dikesirîn. Çavên wan kildayî, birûyên wan qeytani bûn. Çavên xortan di wan de çikiyayı bûn. Dilên wan pêl bi pêl bû. Simbêlê xortan badayî, ji xwe zaf razî bûn. Bi kurtî, roj roja wan, dil dilê wan bû...

Bavo sê mî kiribû. Xalê Çolox wan yek bi yek davêt erdê û şerjêdikir. Paşî Xalo wan pif dida, zikê mîyan mezin dibûn, diwerimîn, dibûn wek heban. Em zarok li dora Xalê Çolox civiyabûn. Me bi çavekî mezin lê mêze dikir. Xalê Çolox ûr, rodik, parsû û goşt ji hev vediqetand û dida destê jinan ji bo patinê. Jina sîtilê mezin danibun ser tifikan. Kela avê li ser sîtilan de diqulibi û diket nava agirê.

Ne tenê gundiyên me, hemû eqrebe û nasên me jî hatibûn. Kêfa bavo pirr li cî bû. Şûr simbêlê wî nedbirî. Îro roja sineta Azad bû. Ev hewqas heytehol, hewqas govend û mesref ji bona çûçikê Azad bû...

Mêvanan ji Azad re pirr tişt anîbûn. Bavo jê re cilên nû kirîbû. Li serê Azad kumikekî sor, zer, kesk û spî hebû. Dadê jê re çêkiribû. Ser kumikê wî " AZAD " nivisandî bû.

Azad ji kêfe difiriya. Destên wî li pişt qûna wî girêdayî digeriya, piyase dikir. Bi aliyê min ve qet nedihat. Tim tinaza dikir, dikeniya. Azad zanibû wê çi bê serê wi. Lê dîsa jî li xwe danetanî û li ser vê tiştê nedisekinî.

Ez dîsa wek her rojan bê kes bûm. Kirasê min kevin bû. Qenebe kesî çoqlatekê jî neda min. Çi dihat ji Azad re bû.

Institut kurde de Paris

Bavo carna Azad dida ser milên xwe û digeriya. Mezinan yeko yeko ruyê wî maçî dikir û kêfa xwe jê re tanîn. Bavo çû hewşê. Li hewşê dewşekekê gulgulî raxistî bû. Bavo Azad danî ser dewşekê. Kumê wî derxist, porê wî şe kir. Apê Xazar û çend merivên din hatin ba Azad rûniştin. Apê Xazar sinetkirekî bi navûdeng bû. Bi eslê xwe bafile bû. Zarok jê pirr ditirsiyan. Zaf caran Apê Xazar hem bavan, hem jî zarokan bi destê xwe bi eynî cûzani sinet kiribû. Emrê wî nêzê heftê salî bû.

Apê Xazar kincên Azad hêdî hêdî bi tinaz û henekan jê kir. Çûçikê Azad danî nav kefa destê xwe, mizda. Paşî ji ceba xwe cûzanê derxist. Serê çûçikê Azad bi avekı şil kir û çermê çûçikê wî bi aliyê xwe ve kişand. Û ji nişka ve cûzanê lêxist. Qîjînî ji Azad çû. Dewşek di xwînê de ma. Bav û pismamê min bi dest û lingên Azad hişk girtibûn ku xwe nelebitîne. Apê Xazar, tozekî gewr li çûçikê Azad kir û di nav potikan de pêça. Dawiya girîna Azad nedihat. Bavo potikek xistibû devê Azad, ji bona ku diranên xwe neşkêne.

Di navberê de qederek wext derbaz bû. Azad xayis ketibû. Li derve def û zirne sekinî bû. Dem dema xwarin û vexwarinê bû. Di nav hewşa me de, ji sêniyên savar û goşt cî nema bû. Reqîna kefçiyan, çingîna sanikan ji dûr ve dihat bihîstin. Di germa havinê de, di bin roja kelyayî de ziyafeta goşt û savarê seyrekê xweş bû. Kûçik û pisîkên gund jî, ji vî ziyafetê ne be pa bûn. Ew jî wek me li hevdû civiyabûn û kirtekirta hestiyên wan bû.

Berê êvarê Azad çavên xwe vekir. Di nav xwida-

Institut kurde de Paris

nê de mabû. Deng jê dernediket. Mêvanên me hê neçûbûn. Ez heta saxbim li dinê ez vê rojê ji bîr nakim. Ji hêsûdbûne ava reş ketibû çavên min. Ziqeziqa diranên min bû. Lêvên min li hevdû diketin. Qirika min teng bûbû. Min ji nişka ve derpiyê xwe ji xwe kir û xwe avêt ser dewşekê û gîriyam:

- Min jî sinet kin, min gote wan. Ez jî dixwazim sinet bibim...

Bu terpina bavê min û li min da. Min da ber pehinan, ber şîmaqan. Ruyê min di tifa bavo de wenda bû. Ji lêdanê laşê min di xwînê de mabû. Bavo bi porê min girt û min avêt derê hewşê.

Bu tiqetiqa mêvanan, zarokan, jinan, keçan û bi min keniyan. Ez bazdam û çûm pişta bênderan. Min xwe di nav giyan de veşart.

Berê evarê gava ez hatim malê mêvan çûbûn. Bavo dîsa li min da, dev û pozê min tijî xwîn kir. Dadê bi zorê min ji nav lepên bavo derxist.

Piştî sineta Azad ez mabûm lepekî. Zarokên hevalên min gelek caran dixwestin fîstanê min bilind bikin û li nav gavên min mêze bikin, ka ez sinet kirî me, an na... Lê belê min nedihişt, bi çêr û qareqar û lêxistin dibeziyam wan. Min ruyên wan dida ber quncrikan û direviyam.

Mesela daxwestina min a sinetê zû deng da. Herkes bi vî tiştî dipeyivî. Ez bûbûm mesqera gundiyan...

Azad êdi xwe mêr dihesiband. Keçikên hevalên wî jê nediqetiyan. Keçikan wî tazi dikir û li çûçikê wî mêze dikirin. Azad wek kûçikên har li ser piştê xwe davêt erdê, gavên xwe vedikir û çûçikê xwe

Institut kurde de Paris

nişanê wan dida.

Ez û Azad, me pênc salê xwe tijî kiribû, em ketibûn sala şeşa.

Institut kurde de Paris

## PÎRİKA MİN

Rojek pîrika min hat mala me.Ew li gundeki din dima. Her neh zarokên wê jî zewicî bûn. Wê ji zarokan pirr hes dikir. Lê zarok anîn jê derbaz bûbû. Ji bo vê yekê pîrika min dixwest ku hinek ji torinên wê li balê mezin bibûna. Bi baweriya wê malên bê zarok ne tu mal bûn. Malên bê zarok malên bê oxir bûn.

Di sineta Azad de ew tiştên ku hatibûn serê min, pîrika min jî dîtibû. Bi halê min zaf dêşiya. Ji dadê û bavo, ji gundiyan nefret dikir. Pîrika min dixwest min ji nava lepên wan derxe.

Evarê gava bavê min hat mal, pîrika min jê re got.

- Hêlînê bide min. Ez dixwazim wê xwedî bikim.

- Fermo, bavê min got. Hêlîn ji te re pîroz û bimbarek be. Vê keçika bêar, qirêjok û qelsok ji ber çavên min bibe. Ez keça wusa naxwazim. Ku tu wê bibî, ê tu qencîkî mezin li min bikî.

Dadê piştî min û Azad du kurê din jî anîbû. Me navê wan danîbû Ferho û Baran. Dadê dixwest ku ji bela min û Azad dûr bikeve. Rebenê tim meşxul bû. Ji karûbarên malê nikaribû serê xwe hilda. Şerê min û Azad wê pirr dêşand. A rasti min jî dixwest biçim mala pîrika xwe û hinek isrehet bikim. Ez xeribê mala xwe bûm. Daxwestina pîrika min, dilê min şa kir. Ken ji ruyê min dibariya. Bakî

Institut kurde de Paris

germ û xweşik ketibû dilê min û digeriya. Ezê êdi ji van merivan xelas bibûma. Ma ji vî çêtir çi hebû gelo ?

Piştî çend heftan ez û pîrika xwe bi rê ketin. Meha gulanê bû. Roj hê derneketibû. Dinya li ber gewrbûnê bû. Bakî honik û nerm destpê kiribû. Em di mêrgekî de derbaz dibûn. Giya û nefelên mêrgê şil bûn. Kiras, derpê û pêlavên me di nav avê de mabûn. Riya me dûr bû. Pîrika min carna kilama digot. Carna gopalê xwe li qirşan, li gezikan dida û disekinî. Roj hêdî hêdî xwe di ber çiyan de derdixist. Agir ji devê wê dibariya. Tirêjên Rojê ketibû ruyê esmên. Bi derketina Rojê ; kêzik, gumgumok, mazelilk, mar û mustran ji qulên xwe derdiketin û diherikın. Mêrgan serê xwe radikirin û gêş dibûn. Gul, pıvok, sêvanok, şoqil, drîmok hawirdora me dixemilandin. Genim firîk dabûn. Di nav geniman de xwuşîniya maran, teqereqa kisokan, vizîniya mozan dihat gohên me...

Ber bi nîvro, me xwe avêt bin siya darekî. Nêzî darê kanîkî hebû. Pîrika min nanê me ji turikê xwe derxist û danî ber me. Me ji xwe re ; tolik, tûzik, pung, bendik, tirşok û sîrimoka da hev. Pîrika min wan şuşt, porê min şe kir. Ez êdi ji hes kirinê, ji dilovaniyê ne bêpar bûm. Bi salan ev dilxwazi di dilê min de mabû. Ez wisa bawer im ku di dinê de tû tişt nagihîje tama hes kirinê. Gava pîrika min keziyên min dihona, ez ji kêfa difiriyam Ez dibûm wek çivîkên mêrgan, çivîkên bê perr û bask...

Em li bin siya darê qederek runiştin. Ez ketibûm xewê. Berê esirê pîrika min, min şiyar kir û em

Institut kurde de Paris

dîsa bi rê ketin. Germa rojê şikestibû. Roj ji me xatir dixwest û melûl dibû. Pîrika min di rê de limêja mexrebê jî kir. Hîv serê xwe derxist û gelî bi gelî bilind dibû. Çiya diketin ber tava hivê û dibiriqîn Dengê qurqurkan, çîzçîzkan û beqan; ji dehl û deviyan, ji kaniyan, ji mêrgan bilind dibûn. Ez bawer im di dinê de tû deng nagihîje van dengên delal û xweş...

Em nivê şevê gihîştin gund. Gundî ji zû ve ketibûn xewê. Carna zirrîna keran û hewtehewta kûçikan ji nav gund dihat. Pez mexel bûbû. Di bin hîva zîvînî de pîrika min derî vekir û em ketin hundir.

Serê sibê gava ez şiyar bûm, Rojê bejnekî avêtibû. Şerqîna meşkan, girîna zarokan tevlihev dibûn. Jiyana rojê dest pê kiribû. Pırika min şîrê germ, to û mast danî ber min. Min çend parî şekir xiste şîrê û iihev da. Min tu caran tiştekî wusa xweş nexwaribû heta iro.

Berê nivro zarokên gund yeko yeko hatin mala me. Em zarok zû hînê hevdû bûn. Ji bo zarok ji min hesbikin, çi ji destê pîrika min dihat dikir. Ji me re bûkikan, erebokan çêdikir. Çîrokan digot, tinaza dikir û me dida kenandin. Di hefteyek de mala pîrika min bû wek dibistan. Ne tenê zarok, mêr, jin, kal û xort dihatin mala me. Kêfa gundiyan ji min re pirr dihat. Ez bûbûm gula wan. Min li wan naziyê xwe dikir. Min dixwest ku ez jî wek Azad jiyana xwe bidomînim. Pîrika min ji min re kincên nû kirîbû. Min çi bixwesta pîrika min tani cî. Ji tirsa pîrika min tu kes newêribû destê xwe bida min û li min bixista. Ez bûbûm delala gund,

berxa pîrika xwe... Zarokên gundiya xweziya xwe bi min tanîn. Bi rasti ez pirr serxwe ve çûbûm. Min derd û kulên xwe ji bîr kiribû. Gunê min bi zarokan dihat. Dilê min bi wan dişewitî. Bav û diyên wan her roj li wan didan. Zafên wan tazî, birçî û belengaz bûn. Min rojek ji pîrika xwe re got :

- Dadê, gunê min bi van zarokan pirr tê. Jiyana wan ne tû jiyan e. Kî tê li wan tixe. Xwezî ew jî wek min zarotiya xwe derbaz bikrana.

Pîrika min bersiva min da û got :

- Te çi zû ji bîr kir Hêlîn. Ma çîroka lawir nayê bîra te ? Mesela hêk û mirîşkê...

- Mirîşka çi dadê ?

- Ma min ji te re negotiye ?

- Na.

- Madem wisaye, gohê xwe bide min. Ev çirok li gora te ye Hêlîn.

" Rojekî lawirên dinê lihev civiyan û çûn ba Xwedê gazinê. Pêşî mar destpê kir û got :

- Ezbenî waha nabe. Te min çêkiriye, lê birasti te mala min jı şewitandiye. Ev çi hal e ? Ji sibê heya êvarê ez bi ser zikê xwe ve kaş dibim, diçim û têm. Sitrin, kevir, dahlûdevî ez peritandim. Tu gere çarekê ji min re bibînî.

Piştî mar, bû uzzzzina gur :

- Mar rast dibêje, gur got. Tiştên Te tim tevlîhev in. Ê ku te aniye serê min, kesî bi serê kesî naniye. xwezi Te ez çênekiribûma heyra. Bi vî qismetê teng û tarî ezê çawa bikaribim zikê xwe tijî bikim ? Xasma zivistanê gava ku berf dikeve erdê ez tim birçî û belengaz im. Eyb e, şerm e ji te re lo !..

Institut kurde de Paris

Dor hatibû devê. Deva reben dikuliya, kuxtûzirta wê bû. Ji girînê çavên wê sor bûbûn.

- Ma ezê ji te re çi bêjim, Devê got. Tu bixwe halê min dibinî. Te tu derekê min rast çênekiriye. Pişta min, stûyê min, lo hasilî her derên min ne li hev in.A ku pirr li zora min diçe,Te navê min jî xis tiye Quranê ! Goya ez lawurekê piroz im. Lê xwelı li serê min be ku rêberê min ker e. Ez bi vî bejna xwe ya girgirî didim pey kerê, diçim û têm. Hem Quran, hem ker... Naa ezbenî, ez hewqas ne ehmeq im. Roja qiyametê ê destê min di qirika Te de be. Çêtir ew e ku Tu ji niha ve canê min bistinî. Ew çax ezê jî ji Te xelas bibim, Tu jî ji min... Ev derd û kulên ku Te daye min ne bes bû, inca Te qedera min jî xistiye destên Ereban. De were xwe ne kuje !..

Hasilî, ji keran heya kuçikan, hirçan, barazan tim lawir gazinên xwe pêşkêşê Xwedê kirin. Xwedê goh da wan û melekan dinivisand. Beriya ku wê civin biqede, ji nişka ve bala Xwedê bi mirîşkê ket. Dûman ji serê Xwedê rabû. Xwedê pirr aciz bû û qırıya :

- Tu li vir çi diki mirîşko, Xwedê jê re got. Ma ji te çi kêm e ? Min tu lawir wek te delal, xweşik û nazik çênekiriye heya iro. Qismetê te fire ye, meriv xwarin û vexwarin didin te. Ciyê te di koxikê de germ e, baş e. Ma tu şerm û fedî naki ji bavê xwe hatiyi vir. Carekê din çavên min te nebînin.

Mirîşk ji peyva Xwedê pirr aciz bû. Perrên xwe vekir, çavên xwe ji Xwedê re sor kir û got :

- Xwedaho !.. Xwedayê mezin. Ji min kiri ku Tu

Institut kurde de Paris

bi her tiştî dizanî. Lê ne rast e. Ger ku Tu zaf zane bûyayî, Te ji min re van qisên qor nedikir...

Bu tiqetiqa Xwedê û keniya.

- Ka bêje, Xwedê got. Ma çi ji te kêm e ?

- Te got çi ji min kêm e ?

- Erê, çiyê te kêm e mirîşkê.

- Baş e, ezê bêjim mirîşkê gote Xwedê : Ya hêka min piçûk bike, ya quna min mezin bike !.. Ez çiriyam lo ! ''

Piştî çirokê pîrika min li min mêze kir û keniya.

- Hêlîn keça min, pîrika min got. haya kesî ji hêka te tuneye. Ma ne wusaye keça dadê ?

Min serê xwe tewand û bersiva wê ne da...

Ger ku ez rojek mêr bikim û zarokên min çêbin, ezê vê çirokê ji wan re jî bêjim..

Institut kurde de Paris

# MÊVAN

Zivistan zû derbas bû. Bihara xweş û geş dinê xemiland. Barana biharê mêrgan têr avî kir. Lehî gihîştin hev, zikê erdê qelaştin. Çi kete ber wan, bi xwe re birin. Berxik, karik, golik û pez bi kêfa dilê xwe çêriyan. Dinya kirasekî şın li xwe kir. Di vî kirasê delal û nerm de deqên sor, zer, kesk, spî, hasilî hemî rengên ku tên bîra meriv, tê hebûn. Di nav wan rengan de ; çivîk, kivroşk, kûsî, beq, mar û lawirên dinê kêfa biharê derdixistin. Nêrgizên kofîxwar, newroz, binefş û beybûn ; newalan, mêrgan, çiyan, çeman dixemilandin. Gula palvedabûn ser nêrgizan ; şîlan û sosin, beybûn û alal ketibûn naziya...

Lê bihar bi dirêjî ber xwe neda. Havîn bi ser ve girt, kirasê wê yê deqdeqî şewitand. Genim zer bûn. Me firîkan kizirand di nav tendûran de. Palên gund dasûkên xwe ji kewara derxistin, devê dasûkên xwe tûj kirin...

Rojek di van rojên kelyayî de mêvanek hat mala me. Mêvan ji gundê me bû. Min wî nas dikir. Mêvan ji pîrika min re got :

- Bavê Hêlînê dixwaze ku hun vê heftê biçin ba wan. Bi rastî wan pirr bêriya we kirine. We dawetê ziyafetê dikin.

Ez bi hatina mêvan pirr kêfxweş bûm. Eva serê saleke ku min dadê, bavo û zarokan nedîtibû.

Institut kurde de Paris

Pîrika min, piştî ku mêvan çû dest bi girînê kir. Ma çi bûbû gelo ? Pîrika min ji bo çi digiriya ?

- Dadê, min gote pîrika xwe. Tu çima digirî ? Ma tu naxwazi em biçin mala me û zarokan bibînin. Ciyê kêfa te bê, tu xwe dêşini.

Pîrika min bi dilekî şikestî bersiva min da û got :

- Hêlîn, tu bi mesela kerê dizanî ?

- Kera çi dadê ?

- Gohê xwe bide min Hêlîn : Rojek dişeynin pey kerê ku were dawetê. Ker dest bi girinê dike û dizire. " Tu çima digiri kera delal ? " jê dipirsin. Ker bersiva wan dide û dibêje : " Ma ji av kişandinê pêtir ez bi kêrı çi têm gelo ? "

Min tiştek ji vê çırokê fêm nekir. Dibe jî ku pîrika min aqlê xwe teklehev kiribe.

- Dadê min gotê. Mesela kerê neket serê min.

- Ez dizanim Hêlîn, pîrika min got. Tu hê piçûk î. Bav û diya te dixwazin mesela kerê bınin serê me. Diya te îro sibê wê zarokekî dinê bîne. Tu mecbûrî alikariya wê biki. Ji kaniyê av bikşînî, li zarokan mêzekî û potikên wan bişoyî. Û payizê tê dest bi dibistanê biki...

Institut kurde de Paris

## DESTPÊKA DİBİSTANÊ

Wê payizê min dest bi dibistanê kir. Ji diya min re keçikek çebû, me navê wê danı Bêrıvan. Ez êdi ne bê xwişk bûm. Bavo ji min re pirtok, pênûs û defteran kirıbû. Pênusên min rengîn bûn. Ji wan, dev û lêvên min, destê min ; sor, zer, kesk, şîn û reş dibûn. Ez timî bi pênûs, defter û pirtokên xwe re radiketim. Ev tiştên han bûbûn perçekî ji jiyana min. A xweştir û giringtir, gava ku ez hînê reqem û herfa bûm. Min xwendin û nivisandinê zû bişkaft. Roj bi roj zêhna min lê vedibû. Tiştên nû derhal diketin serê min. Ez di dersan de ji Azad pirr zîrektir bûm.

Azad hînî dibistanê nedibû. Pirr caran ji dibistanê direviya. Bavo her roj bi cetwelê li serê pêçîkên wî dixist û dida ber şimaqan. Xezeba bavo ser Azad de dibariya. Serê siban diya min bi zorê Azad radikir. Azad bûbû derdekî mezin ji bavo re. Lê ez zû siyar dibûm. Dibistan li min hatibû. Jiyana min gohiribû. Xem û kulên min hewqas nemabûn.

Payiza ku min dest bi dibistanê kir, bavo dan gundekı din. Gundê me yê nû, gundekî şên bû. Dibistan ji gund dûr bû. Dibistan li serê girekî hatibû ava kirin. Ji gund, cam û sacê dibistanê di bin rojê de diçilwilin, dibiriqin. Seyreke xweş didan çavan. Mala me nêzî dibistanê bû. Dersxaneki

Institut kurde de Paris

me hebû. Ji bo vê yekê zarokên mezin serê sibê, ên piçûk jî piştî nîvro dihatin dibistanê. Mamostê zarokên mezin Tirk bû. Mamoste bi kurdî nizanibû. Me jê tiştek fam nedikir. Ew li me mêze dikir, dikeniya, me lê...

Mamostê Tirk di dibistanê di odeke piçûk de dima. Bêkar bû. Xwarin patin ji destê wî nedihat. Li mala me xwarin dixwar. Diya min kincên wî dişûşt, ûti dikir. Bi rastı jiyana mamoste zor bû. Gunê me pê dihat, dilê me pê dişewitî. Mamoste tim diçû bajêr ba hevalên xwe yên Tirk û bîna xwe derdixist. Ew çax zarokên mezin bê mamoste diman.

Bavên zarokan nedixwestin zarokên xwe bişînin dibistanê.

- Emê çi bikin ji dibistanê ? digotin. Ma bav û kalên me jiyana xwe li dibistanan derbaz kirine, heta em bikin. Bê dibistan jî meriv dikare jiyana xwe bidomîne.

Pirraniya wan bi xwendin û nivisandinê nizanibûn. Di cahiltiyê de rabûbûn. Haya wan ji dinê tune bû. Firebûna dinê wek hawirdora xwe didîtin. Yên ku li eskeriyê hinek tirkî fêr bûbûn jî, dısa nikaribûn rojname û pirtokan bixwendana.

Rojek min ji bavê xwe pirsi :

- Bavo, çima em bi zimanê xwe dersê nabînin ? Ji bo çi pirtokên kurdî tunene ?

Bavê min bersîva min da û got :

- Zmanê me qedexeye keça min. Em Kurd in. Ji bîr neke.

Gotina bavo neket serê min.

Institut kurde de Paris

Roj derbas dibûn. Serê siban dîka em şiyar dikirin. Dîk seetên gund bûn. Beriya ku wê roj derkeve, serê sibê zû yek ji wan dest bi bangê dikir. Yên din tax bi tax, kuçe bi kuçe bersiva hev didan. Gund di nav dengên wan de dima. Mirîşk di koxikên xwe de dilisîyan, dilên wan bi dengên dikan şa dibû. Serê xwe didan hev û dest bi pite pitê, dest bi fesadiyê dikirin...

Herwekî min li jorê jî got, ez piştî nîvro diçûm dibistanê. Lê dîsa jî ez serê siban zû şiyar dibûm. Ne ku kêfa min ji xewa sibê re nedihat, lê belê ez ji mal direviyam. Xwişk û brayên min bûbûn bela serê min. Diya min tim digot :

- Keça min, gava tu diçi derve Baran û Ferho jî bi xwe re bibe.

Teklîfa diya min wek pizotê agir diket dilê min. Ez tim bi wan re meşxûl bûm. Ez ji qîreqîra wan têr bûbûm.

Bavo carna digot :

- Hêlîn qevdikên te êdi bi kêrî av aninê tên.

Dadê peyva bavo tesdîq dikir û digot :

- Ma bi kêrî av anînê tenê, Xwedê ji te razi ? Hêlîn êdî dikare zarokan jî bide pişta xwe û bigerîne.

Gotinên dadê û bavo li xweşa Azad diçû.

- Qevdikên wê bi kêrı firaq şûştinê jı tên, Azad digot û bazdida derve, diçû. Azad alikariya malê qet nedikir. Bûbû tolazê nava gund. Derd û kulê wî lîstîk bû. Bi sedan kapên wî hebûn. Gava baran dibariya û erd şil dibû, bi gilçan dileyist. Kes nikaribû pê re bileyista. Azad xar û holikan bi deste xwe çêdikir. Ji newala gund kevirên nerm tani. Wan ke-

Institut kurde de Paris

viran dişikand, piçûk dikir. Piştî çend rojan kevir gilover dibûn. Bi kakilê gozê wan diberiqand.

Di sinifa min de keçikek hebû, navê wê Emo bû. Min ji Emo pirr hes dikir. Emo sê sal ji min mestir bû. Lê dereng dest bi dibistanê kiribû. Xwişkên Emo zewicî bûn û çû bûn gundên dinê. Emo li ba bav û herdû brayê xwe dima.

Bavê Emo tim digot :

- Emo gere karûbarên malê bike. Dibistan ne ciyê wê ye. Îro sibê emê wê bidin mêr. A baş ew e ku Emo hînê xwarin çêkirinê bibe. Zikê birçî bi xwendinê têr nabe.

Lê Emo disa jî piştî karûbarên malê dihat dibistanê. Emo ji xwendinê pirr hes dikir. Mamoste çi bigota pêre pêre diket serê wê.

Emo ji bavê xwe pirr bi kul bû.

- Bavê min, bavekî zaf tima ye, Emo digot. Ji bona ku qelen nede, naxwaze bizewice. Rastî ez dixwazim jinbaveke min hebe. Lê bavo dibêje, ez gere herdû kurên xwe bizewîcinim. Ez bawer im bavê min cesaret nake bizewice. Li maniya digere. Edî pîrûkal bûye. Diran pê ve nemane. Jin pê qayil nabin.

Li Kurdistanê zewac meseleke giring û pirr bi mesref e. Bûk anin tiştekî zehmet e. Meriv gere qelen bide bavên keçan. Pirr caran keç û xort hevdû direvînin û winda dibin. Keç revandin ne tiştekî hêsan e. Bav û brayên keçan tole xwe li erdê nahêlin û xwin dirijînin. Mesele dibe mesela namusê.

- Mala bê jin xirabe ye, diya min digot. Jin jiyana mala ne. Bê jinan mêr stûxwar in. Karûbarên nav

Institut kurde de Paris

xêni ji destên wan nayê.

Emo deh salî bû. Lê karûbarên malê tim li pişta wê bû. Xwarin dipat, cilan dişûşt, av tanî, qoçikan berhev dikir.

- Bav û brayên min ji xwarinê têr nabin, Emo digot. Rojê belki pênc caran firaqan dişom. Pişt li min diqete. Ez ji hal dikevim. Kes alikariya min nake.

Bavê Emo, bavekî pirr bêar û mizmizok bû. Li maniya digeriya. Her roj li Emo dixist. Emo ji bavê xwe nefret dikir.

Lê min ji Emo zaf hes dikir. Bê wê şebra min nedihat. Emo tim di dilê min de bû. Ez carna serê siban bi dizî diçûm mala wê û min alîkarî dikir. Ji bona karê wê zû biqede û bikaribe bê dibistanê, çi ji min dihat min dikir.

Danûsitandina min û Emo, li xweşa dadê nediçû.

- Ez carekê dinê te li mala Emo nebînim, dadê digot. Min sond xwariye, ezê te dax kim. Ezê tiştên nebûyi bînim serê te.

Emo carna diçû mala mele û dersa Quranê didît. Sibekî gava ku ez û Emo laqayên hev hatin, Emo ji min re got :

- Hêlîn, were ez û tu biçin mala mele dersa Quranê îro.

- Ez ji bavê xwe ditirisim, min gote Emo. Bavo pê bihese wê min ji malê derxe. Tu dizani ku kêfa bavo ji tiştên wusa re nayê.

- Kes ji bavê te re nabêje lê, Emo gote min. Ma wê kî bêje ?

Bi kurtî, Emo dawiya dawî ez xapandim. Em çûn

mala mele. Zarokên gund gişt li wir bûn. Keçik û kurik ji hev cuda bûn. Feqiyek dersa kurikan dida, jina mele jî yê keçikan.

Jina mele bi hatina min gelek kêf xweş bû.

- Tu bixêr hatî keça min Hêlîn, jina mele gote min. Bi rastî ez bi hatina te dilşa bûm. Dawiya dawi bavê te hat îmanê û te şande ba min. Ev tiştekî zaf baş e. Hêviya min ew e ku îro sibê bavê te jı here mizgeftê û dest bi limêjê bike. Min ji seyda re tim digot ku, bavê Hêlın meroveki baş û dindar e. Lê seyda ji min bawer nedikir.

Ez di ciyê xwe de çikiyam. Ruyê min sor bû. Diranên min lihevdû diketin. Girîn ji min kêm bû. Lê min dengê xwe dernexist. Ger ku zarok ji bavê min re bêjin, ewê bavo dîn û har bibe. Ji ruyê Emo min serê xwe xistibû belakî mezin.

Jina mele pirr sert bû. Ji tirsa wê kes newêribû bipeyîviya. Zarokan tev bi hev re ders dixwendin. Dengên wan dûr ve dihat bihîstin. Jina mele gohên xwe mûç dikir û li ser şaşiyan disekinî. Ez heyrî dimam. Di wê qelebalixê de jina mele bi çi awayî karibû goh bide teva û şaşiyan derxe ? Ma çend gohên wê hebûn ? Min heta îro jineke waha zîrek nedîtibû.

Ez piştî wê rojê êdi neçûm dersa Quranê. Min ji xwendina Quranê tiştek fam nekir. Quran bi erebî hatibû nivisandin. Ew jî wek tirkî zmanekî bêgane bû. Ez wisa bawer im zarok jî tiştek jê fam nedikirin. Jina mele digot, yên ku Quranê nexwendibin, roja qiyametê wê çavên wan kor bibe û di cehenemê de ê bişewitin. Melekên Xwedê yên ku tên su-

Institut kurde de Paris

alan dipirsin, ji erebî bêtir bi tu zmani nizanin.

Ji tirsa agir û korbûnê xelqê zarokên xwe dişand mala mele û mizgeftê. Tirsa şewatê ketibê dilê wan...

Rojek gava diya min serê min şûşt û şe kir, di nav porê min de çend sipî derket. Diya min wan xist navbera neynûkên xwe û perçiqand. Dadê porê min sa kir. Ji nêçira sipîyan re jêhatibû. Piştî por sakirinê, dadê çend quncrikan li qorika min da û got :

- Ez ji te re dibêjim neçe mala Emo. Bêguman te van sipîyan ji Emo girtiye.

Lê dadê şaş bû. Li gund malên bê sipî tunebûn. Ji mehê carek me xwe dişûşt. Di nav gund de, ji pîsîtiyê meriv nikaribû piyê xwe bavêta. Tuwaleta kesî tunebû. Herkes diçû pişta malan, pişta bendeeran û destavê dikirin. Kani ji gund dûr bû. Av anîn, çûyina kaniyê pirr zehmet bû. Pişta zarokan di bin cêran de xûl dibû. Dadê tasek ava xwe nedida kesî.

A rastî dadê jî dizanî ku, ew ne sipîyên Emo bû. Lê dadê li xwe danetani. Eyba xwe dixist stuyê Emo ya reben û pepûk. Gundî gere nizanibin ku di mala mamoste de jî sipî hene. Ev tişt kêmasîkî mezin bû ji dadê û bavo re...

Institut kurde de Paris

# DENGÊ GURAN

Xaniyê me beton kirîbû. Lê me nedixwest ku em di vì xani de bimînin. Xani ji gund dûr bû. Dadê xweziya xwe bi gundiya tanî, gundî xweziya xwe bi me. Carna bavo diçû bajêr û em tenê diman. Karûbarên bavo yên siyası pirr bûn. Bavo û mamosteyên Kurd gund bi gund li nav gelî digeriyan. Wan dixwest ku gelê me serê xwe rake û ordiya Tirkan ji Kurdistanê bavêje.

Zivistanan li malê nebûyina bavo me ditirsand. Gava berf diket û dinya spî dibû û erd qeşa digirt, guran hicûmê gund dikir. Gurên har û birçî, çi biketa ber wan perçe dikirin, dixwarin. Dibû uzzze uzzza wan û xwe nêzî mala me dikirin. Dadê lembê ditefand û em diketin nava livînên xwe û bêdeng diman. Xwuşka min Bêrîvan di van şevan de dest bi girinê dikir û xwe dixist paşila dadê. Xasma gava hîv mezin dibû, gur êdî har dibûn, bi seetan uzzzini ji wan diçû. Gur û kûçikên gundê me hicûmê hevdû dikirin, xortên me, guran didan ber tivingan. Lê gurên birçî û belengaz ji bo gepek xwarin ji kuştinê, ji kûçikan, ji xortan neditirsiyan û hicûmên xwe kêm nedikirin.

Jiyana zivistanê ji her ali de zehmet bû. Ne gur tenê bela serê me bûn. Di van mehan de me pirr dikişand. Em ji serma diqefilîn, nexweş diketin. Ezingên me têr nedikir. Piyên me ji berfê sordibûn.

Institut Kurde de Paris

Ji serma diranên me li hev diketin û me nedixwest em ji nav livınan derkevin herin derve. Bêguman, rewşa gundiyan ji ê me zehmetir bû. Zivistana har û sert dijminê zarokan bû. Wan yeko yeko dixwar, dikuşt û dêxist bin axa sar, axa cemidî... Zivistan ji bo zarokan ji guran, ji hirçan jî hartir û dijwartir bû.

Ne xanî tenê, dibistan jî sar bû. Serê siban mamostê Tirk zû radibû û sobe pêdixist. Lê germbûna sinifê wext digirt, ode di dumanê de dima. Ji dumanê dibû kuxte kuxta zarokan, çavên me dişewitî, ji wan sitêrk dihat. Bavê min tim digot :

- Serma ji zarokan re ne baş e. Di sermayê de zarok nikarin tiştek ho bibin.

Bavo rast digot. Zarok ji malên xwe darika tanîn dibistanê. Lê carna darik xelas dibûn. Ew çax em zarok tev bi hev re diçûn nava gund û me ji qubikan sergın û taran tani dibistanê. Şewitandina rêx bineke pîs dixist sinifê. Vereşana me dihat. Lê bavo digot, meriv ji bina rêxê namire, lê ji sermê kare bimire. Peyva bavo û bahsa mirinê, bina rêxê dikir wek lewantê ji me re...

Lê zivistan dirêj nedajot. Bihar zû dihat.

Belê, bihar zû hat. Sobe rabûn. Roj bû pizot. Ez li brayên xwe Baran û Ferho digeriyam. Herdû jî piştî xwarina sibê wenda bûbûn. Zarokên mezin bi dengekî bilind bersiva mamoste didan :

- Ez Tirk im. Ez rast im. Ez jêhati me...

A rastî ev sonda ha kêm caran dihat gotin. Ma mamostê Tirk dîn bûye çi ye ? Lê bavê min got, heneka giliya me kiriye û îro sibê wê mufetiş bê

Institut kurde de Paris

qontrolê. Zarok gere vê marşê jiber bikin. Nexwe ewê min û mamostê Tirk têxine hepsê.

Ez çûm nava gund. Min gund li hev xist, lê min brayên xwe nedî. Ez bi aliyê kaniyê ve çûm. Keç û jinên gund cêrên xwe dabûn ser milê xwe û bi lez av dikşandin. Xanî nêzî mala Silo axa bû. Silo axa xwediyê gund bû. Bav û brayên Emo xulamê wî bûn. Li gundiya pirr neheqi dikir. Xwediyê çar jinan û bavê bist zarokan bû. Axa çi bigota mele wek wî dikir.

Bavo ji axa û ji mele pirr aciz bû. Îmana bavo ji wan diçû. Bavo ji me re digot :

- Axe û mele sextekar in û gundiyan dixapînin, dişelînin. Axa bi destê hikumeta Tirkan gundiyan di perçiqîne, mele bi alikariya dîn. Gundiyên reben, nezan û jar di navbera Xwedê û hikumeta Tirkan de man e. Lê wê roja wan bê. Bila zarokên gundiya bixwînin, mezin bibin, ew çax ezê werim hafa wan. Ji bîra xwe nebin, esas şeytanê mezin, marê deqdayi Şêx e...

Bavo pirr zane bû. Piştî peyva bavo, jina mele û roja dersa Quranê kete bira min. Emo digot, zarokên ku diçin dersa Quranê mecbûr in ji jina mele re : hêk, penir, fêkı bibin. Nexwe jina mele dersê nade wan. Gundî her sal mî, bizin, ga, çêlek, genim û pere didin mele.

Ez hatim ber mizgeftê. Mizgeft nêzî kaniya mêra hatibû ava kirin. Feqi li mizgeftê radiketin. Gundiya wan xwedî dikir. Sibe, nîvro û êvaran feqi diçûn nav malan û ratip tanîn.

Henek zarokên bê kes jı li mizgeftê diman. Fe-

Institut kurde de Paris

qiya dersa wan dida. Pirtok bi elfaba erebî hatibûn çap kirin. Xwendina wan zaf zehmet bû. Zaro tênedigihiştin. Feqiya li wan dida û porên wan dikişandin. Di nav sipî û kêçan de digevizîn. Çav êşi bûbû bela serê wan. Destê wan tim di paşila wande û xwe dixwirandin.

Li ber mizgeftê ez leqa Welat hatim. Me kêfxweşi di hev da. Çavên Welat werimîbûn. Min pirsa zarokan jê kir. Lê Welat bersiva min neda, giriya û çû...

Welat yek ji wan zarokan bû. Ketibû sala yazda. Bavê Welat beriya sê salan wî teslîmê mele kiribû. Welat ji salê carek bavê xwe didît.

Welat çîroka xwe ji min û Emo re gotibû. Gava çar salî bû diya wî miribû. Bavê wî ji xwe re jinek din anîbû. Jinbava wî jê re qet nebaş bû. Hesreta Welat qetek nan bû. Jinbav çi bigota, bavê Welat wilo dikir. Dawi jinbav dibêje, ya ez, ya Welat. Bavê Welat mecbûr dimîne û wî teslimê mele dike.

Lê Welat nedixwest bibiya mele. Ji xwendina erebî nefret dikir. Lê bê çare bû. Ma wê bi ku de biçiya ? Zarokên sêwî tim stûxwar in. Qet nebe li mizgeftê ciyê razana wî hebû. Gundiya qetek nan davêtin ber...

Gunê min û Emo zaf pê dihat. Gava li gund yek bimira, feqiyan kincên wan li hev bela dikir. Carna tiştek para Welat jı diket. Ez û Emo me bi dizî xwarin dida Welat, cilên wî dişûşt. Xasma kêfa Welat ji nanê me re pirr dihat. Nanê me ne wek nanê gundiya bû. Bavo arvan ji bajêr tani. Dadê nan bi şîr û hêka çêdikir. Welat navê nanê me danîbû piskiwêt...

Institut kurde de Paris

## DİKANA MELE

Ez bi seetan li Baran û Ferho geriyam, lê min wan nedît. Dadê ketibû meraqa wan û sondika min dixwar. Ez ji tirsa dadê newêribûm biçûma malê. Min gere brayên xwe bidîta. Baran ji tiştên şîrin pirr hes dikir. Ez rast çûm dikana mele. Dengên wan ji dûr ve kete gohên min. Deng ji dikana mele dihat. Ez ketim nava dikanê. Baran û Ferho şekir dixwarin. Salo û Welat bi hev re dipeyivin. Salo şazde salî bû.

Bîna sabûnê û şekiran ji dikanê dihat. Di dikana mele de we çi bixwesta hebû. Piskiwêt, şe, neynik, destmal, doxinên lastîk, qehwe, çay, kefçî, meqes, kêr... Seyra wan seyreke pirr xweş bû. Min dixwest ku ez tim li dikanê rûniştima û min serê xwe têxista torba şekiran. Min xweziya xwe bi salo tanî.

- Kêf kêfa te ye Salo, min gotê. Gava ez mezin bibim, ezê jî dikanek vekim.

Salo keniya û got :

- Ji xwendinê çêtir tiştek tune Hêlîn. Ez dixwazim bixwînim, lê bavo nahêle. Bavo meriveki pirr tima ye. Bavê min dibêje, ên ku diçin dibistanê dibin hevalê şeytan. Lê dîsa jı bavo min şand dibistanê. Zanî çima ? Ji bo menfeeta xwe yê şexsî. Bo ku bê xwendina latînî meriv nikare biçe bajêr û ji dikanê re tiştan bikire. Ji bona pera bavo derhal xwe dike hevalê şeytên. Lê meraq meke Hêlîn,

Institut kurde de Paris

ezê derbeke mezin li mele bidim. Tê bibinî ku ezê çi bînim serê wî.

Emo jî hatibû dikanê.Welat peyva Salo birrî û go:

- Gava tu ji vir birevî, min jî bi xwe re bibe Salo. Ez bê te naqedînim. Min ji bîr neke Salo. Ez qurbana te me.

- Tu hê piçûkî Welat, Salo got. Bajarên mezin ne ciyê zaroka ne.

- Ku tu bi min re bî, ezê çima winda bibim Salo ? Ezê solan boyax kim û perên xwe bidim te. Bê min neçe Salo. Baş e keko ?

Ez û Emo hinê Salo û Welat bûbûn. Bê wan sebra me nedihat. Kengê firset biketa destê me, em diçûn ba wan. Welat dixwest ku hînê xwendina tirkî bibe. Me her roj dersa wî dida.

Rojek ji rojan mele hat mala me. Agir ji çavên mele dibariya. Kextekuxta wî bû. Çêrên pîs dikir seyda. Bavê min ji ber mele rabû û cî nişanê wî da. Mele rûnişt, dadê çaydan danî ser agir. Bavo ji mele pirsî :

- Xêr e seyda. Ma tiştek qewimiye, çi ye ?

- Belê mamoste, seyda gote bavê min. Namusizê kurê min Salo bi perên dikanê ve winda ye. Em îro pê ve lêdigerin, wî nabının. Tirsa min ew tirs e ku Salo çûbe bi alê İstenbolê ve. Xwedê lawên pîs û bê oxir nede tu mislimanî...

Mele ji bavo alikarî dixwest. Lê bavo hewqas goh nedida mele. Salo, Welat jî bi xwe re biribû. Reva Salo û Welat bûbû wek pizotek agir û ketibû dilê seyda. Taya mirinê wî girtibû... Ev rev kêmasîke mezin bû jê re. Di nav gund de qedr û qiymeta mele

Institut kurde de Paris

şikestibû.

Ez û Emo bi rojan li wan geriyan û ketine xem û şinê. Çûyina wan me pirr dêşand. Em ji xwe re sêwî mabûn. Ew çima bê me çûbûn ? Ma em ne hevalên hevdû bûn ? Ger me ciyê wan bizaniya emê biçûna ba wan. Lê dinya pirr mezin bû û ez û Emo piçûk bûn. Jiyan her tim dijminê piçûka ye...

Institut kurde de Paris

# ESKERÊN TİRKA

Min dest bi sinifa duduya kiribû. Dadê û bavo ji min ra zaf baş bûbûn.Hevalên min êdî bi çaveke din li min mêze dikirin. Daxwaza min ew bû ku, ez bibûma mamoste. Mamosteyî li gora min bû. Azad jî roj bi roj digorîya û pêşve diçû. Daxwaza dilê wî tixtorî bû.

Payîz rengeke sor û zer, rengeke xweş û delal dabû dinê. Heta îro kesî payîzeke waha nedîtibû. Havin bi bereket derbaz bûbû. Gundî çal û kewaran tijî kiribûn. Tirsa wan ji zivistanê nemabû. Mewîj, hejîr, tû û zerdelên xwe hişk kiribûn û têxistibûn sindoqan.

Belê, payîz bi xweşî derbaz dibû. Bavo li ber textê reş sekinîbû û dersa me dida. Ji nişka ve dengê trembêlan kete gohên me. Deng bere bere nêzî me dibû. Reng li bavo nemabû. Tebeşîr ji destê wî ket erdê û bû du perçe. Bavo xwest ku tebeşîrê ji erdê rake, eskeran camê sinifê şikand û ketin hundir. Bavo bi çavekî xemgîr li wan mêze dikir. Eskerek bi qontaxa tivinga xwe li bavo xist û bavo dirêjî erdê kir.Eskeran bavo dan ber pehinan.Xwîn ji dev û lêvên bavo diherikî. Lê deng ji bavo dernediket. Bavo dixwest rabe û li wan bide, lê mecal tê de nemabû. Bi dehan esker ketibûn sinifê. Derî û pencerên dibistanê perçe perçe bûbûn.

Em zarok ji tirsa me xwe dabû quncikekî. Pirrani-

Institut kurde de Paris

ya me bi xwe de mîz kiribûn. Eskeran defter, pênûs û pirtokên me civandin û xistin nava torban. Bi pehînan û bi qamçiyan me avêtin derve. Li ber derê dibistanê mamostê Tirk destên wî kelepçe kirî sekinîbû. Serê wî di nav xwinê de mabû. Çavên wî werimîbûn. Mamoste ketibû şiklekî dinê. Em ji tirsa eskeran newêribûn nêzî wî bibûna. Mamoste bi çavekî şikestî û stû xwar li me mêze dikir...

Paşî bavo jî anin ba mamosteyê Tirk. Destê wan bi hev ve kelepçe kirin û berê xwe dan gund. Zarokên mezin, ên danê nivro dest bi dibistanê dikirin, li hawirdora dibistanê civiyabûn. Zarok eskeran didan ber keviran û direviyan. Eskeran ji bo ku zarok bitirsin, çend fişekan teqandin, lê feyde nekir. Bi dengê bilind zarokan çêrê wan dikir û digotin : " Qatil, xwînmij. Ji gundê me siktir bin herin. Em we naxwazin..." Peyva zarokan li zora wan diçû û har dibûn, didan pey wan. Lê zarok sivik bûn, xwe nedidan dest. Em nêzî gund bû bûn. Serê girikan û newal tijî esker bûn. Hawirdora gund hatibû girtin. Cîp û qamyonên wan li pey hev rêz bûbûn. Eskeran dadê dabûn pêşiya xwe û bi dafa wê tanîn. Bêrivan li milê dadê bû. Ji girînê çavên wê sor bûbûn. Di nîv seetî de eskeran mal bi mal oxilme kir û me di nav meydana gund de civandin. Ji dapîra heta bapîra, ji nexweşan ta bigre zarokên yek mehî anîn meydanê. Li ber meydanê hinek subay runiştîbûn. Sendelyan ji dibistanê anîbûn. Tiqetiqa kena wan bû. Em runiştin. Mezinên me bê deng bûn. Serê wan di ber wan de xwar kirê, li erdê mêze dikirin. Dawî li girîna zarokan nedihat.

Institut kurde de Paris

Qederek derbas bû. Subayek rabû piya û bi tirkî dest bi peyvê kir. Peyva subay dirêj ajot. Tirkiya min hewqas ne baş bû. Ji tirsa eskeran, min tirkiya xwe bi temamî jibîr kiribû. Pirraniya gundiyan jî bi tirkî nizanîbûn. Ji bo vê yekê eskeran hinek rakirin piya û kincên wan ji wan kirin. Reben çip tazî man. Hinek ji wan xwestin ku li eskeran bidin, lê dest vala bûn. Esker wek gurên ku dikevin nav pez, wusa ketin nav me. Bi şîşên tivingan li me didan. Ciyê şîşan di laşê me de dima, çermê me radibû. Qareqara me û qîjına zarokan diçû esman...

Lavelava jinan, girîna zarokan, duayên pîran feyde nedikir. Hikumeta Tirka li me hatibû xezebê. Xelasbûna me ji destê wan tunebû. Em esîr ketibûn destê wan. Xirama rehmê para wan neketibû. Ji evînê bê par bûn. Jiyana xwe li ser lêxistin û bênamusîyê ava kiribûn...

Dawîya dawî me teva tazî kirin. Kincên me ji me sitandin û li cikî dûr kom kirin.

Bavo û mamostê Tirk nêzî subay sekinîbûn. Destê wan kelepçe kirî bû. Herdû jî tazî bûn. Dadê xwe dabû pişta bavo û destê xwe danîbû ber xwe. Subay xwe nêzî bavo kir. Çar esker hatin ba subay û sekinîn. Subay bi wan re peyivî. Piştî peyva subay, eskeran diya min ji erdê rakirin û wê danin nav milên bavo. Qêrînî ji bavo çû. Bavo ji nedîve serê xwe li nav ruyê subay da. Xwîn ji pozê subay herikî. Subay serê xwe xiste nav destên xwe û çokiya erdê. Eskeran bavo dan ber şîşên tivingan. Bavo terayê erdê bû. Diya min ji ser milên bavo pekiya, serserkî li erdê ket û bê hiş ma. Min baz da

Institut kurde de Paris

û xwe avêt ser wan. Subay pehînek li kêleka min da. Bîna min çikiya, dinya reş bû, dilê min sekinî. Eskeran bi lingê me girtin û me bi erdê re kaş kirin û anın ba gundîyan... Gundî ji tirsa direcifin, deng ji wan dernediket. Lêviya dora xwe bûn. Weke pezên ber qesaban, stûyê xwe xwar kiribûn û li me mêze dikirin.

Zarok ji girînê têr bûbûn. Hinek esker çûbûn nava mala û li tiştan digeriyan. Şikestina firaqan, şûşe û sondoqan dihat me. Bi torban eşya dikişandin meydanê. Dasûk, bêr, çakûç, das, meqes û tiştên din ji torban vala dikirin. Lê çek û silahan nedîtibûn. Subay dîsa dest bi peyva xwe kir. Subay ji gundiyan çek dixwest. Lê tu kes çekên xwe teslîm nekir. Agir ji devê subay dibariya. Esker carna dest davêtin çiçikên jinan, gavên wan ji hev vedikirin û dikeniyan. Jina wan didan ber pehinan û destên wan gez dikirin...

Subay dest bi talîmê kir. Subay digot : " Rabîn, runên, bazdin, bisekinin, marş marş... " Em ser zikên xwe de kaşdibûn. Kevir, xwelî û sitrîn em diperitandin...

Piştî talimê, em rakirin piya. Subay gazî mele kir. Jê hinek tişt pirsî. Mele bersiva subay neda. Subay dixwest ku mele jê re ciyê çekan bêje, an jî çekên kî hene, wan bide dest. Lê mele dengê xwe dernedixist û nepeyîvî. Subay hêrs bû û çend şimaqan avêt mele. Paşî subay gazî Emo kir. Eskeran bi çepîlê Emo girtin û anîn balê. Subay şerîtek peyda kir. Eskerek wê şeritê bi gunikê mele ve girê da û şeritê da destê Emo... Emo destê xwe ji ber xwe

Institut kurde de Paris

ranedikir. Eskerek dest avêt çiçikê Emo û givaşt. Bi qamçiyan Emo hereket kir û mele da pey wê. Seyra mele û Emo kêfeke xweş dabû wan. Ji kena dixeriqîn. Av ji devê wan dihat. Huro huro dikirin û destên xwe li hev dixistin. Mele ser dev xwe avêt erdê û bû term... Emo şerit berda û bi aliyê me ve baz da hat. Emo ji dil çûbû. Eskerek cerek av lê kir. Emo di nav heriyê de gevizî, perpitî û dinaliya.

Hikumet, namûs û şeref ji me re nehiştibû. Namûsa me paymal kiribûn. Dê û xwişkên me di nav lingên wan de mabûn. Vekirî, li ber çavan dest davêtin jin û keçan û bi wan dileyistin. Mirin ji vî halî çêtir bû. Lê mirin jî bi destê me nediket. Mirin xwe li naziyê danîbû û bi alîyê me ve nedihat...

Eskera yek bi yek, jin û mêran çîp tazî li hevdû siwar kirin û di nav meydanê de gerandin. Bavo û mamostê Tirk kelepçe kirî li wan mêze dikirin. Vereşana bavo nedisekinî. Eskeran carna serê bavo dixistin nav vereşana wî û digevizandin.

Berê êvarê eskera me li pey hevdû rêz kirin. Subay yeko yeko gazî me kir û ji me pirsî :

- Tu Tirk î, an jî Kurd î ?

Yên ku digotin em Tirk in, wan cihê dikirin. Lê pirraniya gundiyan gotin em Kurd in. Yên ku digotin em Kurd in û bi tirkî nizanin, wan tespît dikirin. Piştî ifade û pirsan, bavo, mamostê Tirk û hinek xortan siwarê qamyona kirin û bi rê ketin. Di nav çend deqan de ji ber çavan winda bûn. Tozûtelaza trembêlên wan di ser me de dibariya...

Tarîtî ketibû erdê. Em bi aliyê kincên xwe ve çûn. Serê me teva xwar kiribû. Em di şermê de fe-

Institut kurde de Paris

tisîbûn. Me bi çavên xwe roja qiyametê dîtibû.

Mala me teklehev bûbû. Savar, dan, rûn, dims, pivaz, penir û tiştên din ketibûn navhev. Eskera bi potînên xwe wan di navhev de perçiqandibûn. Wek conegayên har, mala me wêran kiribûn. Surahi, fincan, şûşên çayê şikandibûn. Dewşek, balîv, lihêfên me perçe perçe kiribûn. Hiriya dewşek û lihêfan di nav dimsê de mabûn. Pirtokên bavo qelaştibûn. Radiyo, teyb û seeta me, ne li ciyê xwe bûn. Eskeran zêrên dadê û tiştên me yên bi qiymet jî biribûn.

Tamîr kirina xênî û tiştan dirêj ajot. Bi hefteyan kes bi kesî re nepeyivî. Ji şerma, mezinên me dernediketin derve. Karûbarên gund mabû lêviya me zarokan. Pirraniya me seqet mabûn. Ji tirsa eskeran xew bi çavên me nediket. Hinek dîn bûbûn û bi çolan ketibûn.Xortên me piştî wê rojê çekên xwe girêdabûn û çûbûn serê çiyan. Xort dixwestin ku sonda xwe bînin cî û dê û bavên xwe li hemberê eskeran biparêzin. Xortan baş fêm kiribû, ku bi zarezarê, bi girînê tişt çênabin. Hikûmeta Tirk bi lavelavê nedihat rê. Gere meriv bersiva wan bi devê tivinga xwe bida... Mezinên me çi gotibûn : " Zêr zane, zor zane, devê tivinga mor zane... "

Çima gelo eskerê Tirk van tiştan anîbûn serê me ? Ma me çi kiribû ? Bersiva van pirsan ji bo min pirr zehmet bû. Lê xortan digot ku, ordiya Tirka di 12 ê Ilonê de dest daniye ser meclisê û meclisê fesix kiriye. General hatine ser hikim. Daxwaza generalan ew e ku, li Kurdan û li çepên Tirkan bixin. Ji vê gavê ve bi deh hezaran kes hatine

Institut kurde de Paris

girtin û di hepisxanan de cî nemaye. Heta îro bi sedan Kurd û çepên Tirkan hatine kuştin, an ji îdam kirin. General dixwazin ku Kurdan ji cihanê rakin û qela wan bînin. Polisên Tirk listekê hazir kirine. Yên ku navên wan di wê listê de ne, yek bi yek tên girtin. Navê bavo û mamostê Tirk jî di wê listê de ne. Ajanên hikumetê pirr in. General ji şiyarbûna gelê me zaf ditirsin...

Bavê min, ji me re tim digot : " Rojek wê tirsa wan bê serê wan. Emê Kurdistanê ji wan azad bikin û eskerên wan bavêjin derve. Bi kuştin û bi girtinê Kurd naqedin. Em îro bîst milyon in. "

Institut kurde de Paris

# ZİVİSTANA BÊ BAVO

Piştî bavo û mamostê Tirk, dibistan hatibû girtin. Hikûmet ji me re mamoste neşandibû. Dadê ji işkence û lêdanê nexweş ketibû. Di nav ciya de dinaliya. Kuxikeke pîs wê girtibû. Rengê wê zer bûbû û tim bi tenişta xwe digirt û digiriya. Karûbarên malê mabû di stûyê min de. Tiştên ku ji destê min dihat, min tanî cî. Bêrivan jî nexweş ketibû, ji sibê heya êvarê qareqar dikir û sekin pê nediket. Zarokên gundiya bi çavêşê ketibûn û zatoriye pêşa wan bernedida. Esker ji gundê me çûbûn, lê zilma wan dom dikir. Baran û Ferho, ji dadê tim pirsa bavo dikirin. Herdû jî, ji hepisxanê tiştek fêm nedikirin. Ev nav nediket serê wan. Ji bo vê yekê, Ferho û Baran her roj diçûn ser rê disekinîn û bi seetan çavrêyiya bavo dikirin. Bi şev di xewa xwe de vediciqin û hildipekiyan, lêvên wan diterikîn û pizirk digirtin. Bi qêrîna wan em jî şiyar dibûn. Berivan dest bi girînê dikir.

Em bê xwedî û bê kes mabûn. Perên me li ber xelasbûnê bû. Maaşê bavo hatibû birrîn. Dadê ji me re tiştan ji dikana mele bi deyn tanî. Roj bi roj deynê me zêde dibû. Li mele dengê xwe nedikir.

Piştî hedisa eskeran, mele êdî nediçû mizgeftê. Tim li malê dima û difikirî. Ji şerma xwe bi kesî re nedipeyivî. Hinek digot ku, mele haziriya xwe û mirinê dike. Lê şêx gotibû, " Mele cezayê xwe

Institut Kurde de Paris

dikişînê.Xwedê, mele li vî dinyayê ceza kiriye.Meriv gere ji cezayê Rebbê xwe aciz nebe... " A rastî min ji van peyvan pirr fêm nedikir. Lê disa jî min gohên xwe dida wan.

Emo êdî ji şerma ruyê xwe nediçû mala mele. Emo dest ji xwendina Quranê berda bû. Baweriya wê bi van tiştan nemabû. Emo digot, " Heke ku Xwedê heye, çima çavên eskeran dernaxe ? Ma mele ne wekîlê Xwedê ye ? Meriv wekîlê xwe çawa di nav dest û piyên eskerê Tirkan de dihêle ? Heta îro ki ji me wek mele xizmeta Xwedê kiriye ? Ku Xwedê alikariya mele neke, wê alikariya kî bike, gelo ? "

Jina mele jî dev ji dersan berdabû. Xwendevanên xwe bela kiribû. Ew jî wek seyda dernediket derve. Feqiyan karûbarên wan û mizgeftê tanîn cî. Pirraniya feqiyan li ber mentehiyê bûn. Îsal wê bibûna mele. Lê seyda nedixwest dersê bide wan. Hinek feqî mecbûr mabûn û çûbûn gundên dinê ji bo xwendinê.

Dikana mele roj bi roj vala dibû. Mele tiştên nû nedikirî. Gundî mecbûr diman û diçûn bajêr tiştan dikirin. Bajêr ji gundê me zaf dûr bû. Çûyîn û hatin wext digirt. Gundî bi zmanê bajeriyan nizanibûn. Gelê bajêr tinazê xwe bi wan dikirin. Xwediyê dikanan wan dixapandin, eşyayê nebaş û çirûk difirotin wan.

Zivistan hawirdora me girtibû. Berf li ber çokê bû. Bayê zivistanê wek qamçiyên eskerên Tirka li me dixist. Li kî keysa xwe baniya pêre pêre dikuşt an jî nexweş dikir. Ew jî wek eskeran bêbext û za-

Institut kurde de Paris

lim bû...

Bavo ji bîra min dernediket. Şiklê bavo tim li ber çavên min bû. Ez heya sax bim li dinê, ez wê rojê ji bîr nakim. Di jiyana merivan de hinek tişt hene ku tu car nayên ji bîr kirin...

Dibistan wêran bûbû. Derî û cam pêva namabûn. Zivistana har bi kêfa dilê xwe ketibû dibistanê.Nava sinifa me tijî berf bûbû. Sendelî û masên dibistanê şikestibûn. Dadê wan dixist sobê û dişewitand.

Ferho û Baran bavo zû ji bîr kirin. Edî hînî sêwîtiyê bûbûn. Gotina pîrika min dihat bîra min. Pîrika min digot, " Zaro tiştan zû ji bîr nakin. Tiştên ku meriv di zarotiya xwe de derbaz dike, ew tişt nayên ji bîr kirin... " Lê Ferho û Baran çima wilo bûn ? Tewrê wan nediket serê min.

Carna berf lepe lepe dihat. Min bi seetan di penceran de lê mêze dikir. Lê dîsa jî dilê min şa nedibû. Ev berfa delal jî nikaribû agirê dilê min bitefanda. Nexwe min ji berfê zaf hes dikir. Carna ez û bavê xwe diçûn nêçirê. Bavo neçirvanekî jêhatî bû. Gundi li çolê ji hev beladibûn û kewa radikirin. Dibû hirohiroya me û em diqîriyan. Kew difiriyan û me dida pey wan. Dawî kew diwestiyan û diketin nava berfê û me wan digirt.

Lê ev zivistan bê nêçir derbaz dibû. Eskeran vê kêfê ji me standibûn. Zarokên gundiyan ji xwe re dafa çêdikirin û dafikên xwe datanin serbanan. Li hawirdora dafikên xwe ka û ce direşandin. Çivîk bi ka û ce dixapiyan û diketin dafikan...

Institut Kurde de Paris

## HEPİSXANE

Dawiya zivistanê bû. Berf diheliya. Pîvokên biharê serê xwe di bin berfê de radikirin. Giya şîn dibû. Berf li ber barana biharê nedida û roj bi roj winda dibû. Bi kul û keseran me zivistanê derbas kiribû. Haya me ji bavo tunebû. Hineka digot ku bavo kuştine û termê wî avêtine nava çem. Hineka jî digot ku, bavo di hepisxana Diyarbekirê de ye. Kes bi rastiyê nizanibû. Herkes ji xwe re tiştek digot.

Şevekî mêvanek hat mala me. Şev dereng bû. Zarok ketibûn xewê. Lê ez û Azad şiyar bûn. Em ketibûn nava livîna û me gohê xwe dabû peyvên mêvan. Me mêvan nasdikir. Ew jî bi bavo re hatibû girtin. Navê wî Reşo bû. Reşo xortekî bîst salî bû. Bavo jê pirr hes dikir.

Reşo bi dengekî nizim dest pê kir û got :

- " Gava ku eskeran me li trembêlê siwar kir, em tev tazi bûn. Nêzî bajêr eskera piceman li me kirin. Paşê destên me xistin kelepçan û çavên me girêdan. Edî me hevdû nedidît. Haya me ji hev nemabû. Em çawa diçûn, bi ku de diçûn me nizanibû. Roj û şev teklehev bûbûn. Bi lêdan û tadeyiyê me rê distand. Dawî trembêl sekinî û em peya bûn, Eskeran me dan pêşiya xwe û em ketin xanîkî. Çavên me girêdayî bû û me tiştek nedidît. Lê bi hiş û aqilên xwe me hawirdora xwe dipîva. Em di dere-

Institut kurde de Paris

can de berjêrê xwarê bûn. Bînekî pîs ji mexzenê dihat. Şerqîna vekirina deriyan dikete gohên me. Çaraliyê me tijî kes bûn. Eskeran derî li me girtin û çûn. Ez û mamoste rûniştin, lê ji tirsa em bi hev re nepeyîvîn.

Di navberê de qederek wext derbaz bûbû, ji nişka ve qêrînîya merivan kete gohên me û em veciniqin. Qarînîkî bê tarîf ji wan dihat. Min tu car dengê wisa nebihistibû. Lawelawa wan agir dixist dilê me. Me haziriya xwe û işkencê dikir. Me zanîbû ku wê çi bihata serê me.

Ez nizanim çiqas wext derbas bûbû. Em ji têna diperitîn. Lê tu kes bi aliyê me ve nedihat. Çend rojên me wisa derbaz bûn.

Dawi qerdiyana deriyê me vekir û hatin ba me. Destê me ji kelepçê derxistin. Yek ji wan gote min :

- Tu gere imza xwe bavêjî vê kaxizê. Piştî imzê emê we berdin.

Mamoste bersiva wan da û got :

- Hun heta çavên me venekin, em wan kaxizan imze nakin. Emê çawa bizanibin we çi nivisî ye ?

Piştî peyvên mamoste, qerdiyana dest bi işkence kirin. Me dan ber copan û pehînan, li zikê me yê birçî dixistin. Em dibûn wek gopalan. Piştî copan, feleqe dest pêkir. Me dan ber şîşên tivingan. Binê piyên me di xwînê de dima. Eşa pê davêt dilê me û em ji xwe diçûn. Feleqe qederek dom kir. Edî ji me deng dernediket. Em ji êşê têr bûbûn. Dengê me ketibû. Em di nav xwîna xwe de digevizin. Piştî feleqê me rakirin piya. Lê me nikaribû ku li ser

Institut Kurde de Paris

lingên xwe bisekinin. Qerdiyan ketin bin çengên me û me rakirin piya. Nava hucrê xwey kirî bû. Bi gerînê qarin ji me diçû. Xwey birîna me dikewand. Mixê mejiyê me dihejiya. Muyê laşê me çik dibûn. Em carna serdev tera dibûn. Xwey diket nava dev û pozên me. Em diperitin, dişewitin û ji erdê dipekiyan, radibûn ser lingên xwe... Bi kurtî, derekî saxlem di me de nemabû. Me çi bikira, em dêşiyan, qarinî bi me diket...

Qerdiyan êdî ji lêdanê aciz bûbûn. Dev ji me berdan û çûn. Piştî bîsteki dengê kûçikan hate me. Çend kûçik xwe li derî xistin û ketin hindir. Kûçika xwe avêt ser me û bi zmanê xwe me dialastin. Bînekî pîs ji wan dihat. Kûçika devê xwe dixist birînên me û lê dimijiyan.

Şerê me û kûçikan dirêj ajot. Kûçik dev ji me berdan û çûn. Ez û mamoste dîsa tenê mabûn. Me hê bîna xwe nedabû, qerdiyan dîsa hatin ba me. Qelem û kaxiza danin ber me, ji bo îmze kirinê. Lê me îmza xwe navêt.

İşkence hefteyek ajot. Em roj bi roj ber bi mirinê ve diçûn. Lê qerarê me qerar bû. Me yê wan kaxizan îmze nekira. Wan dixwest ku bi riya wan kaxizan me mahkûm bikin, an jî em hevalên xwe bidin dest. Ev tişt ji bo me mirin bû. Heta ji destê me bihata me yê li ber xwe bida. Zaf zaf wê me bikuştina. Ew ji me re şeref bû. Emê ji bona welatê xwe bihatina kuştin. Ma ji vî xweştir çi hebû gelo?

Piştî kûçikan dest bi işkenca ceryanê kirin. Serê qabloyê bi pêçikên me ve girê dan û cereyan dan me. Cereyan tesîreke pirr mezin li mêjî û li dilê me

dikir. Em diricifin û direhilin... İşkenca cereyanê du roj dom kir. Piştî cereyanê em xistin nava torban û daleqandin. Pisîkan xistin paşila me. Em tazî bûn. Her car ku qerdiyana li pisîkan dixist, pisîk me diperitandin. Ciyê bê xwîn di me de nemabû. İşkenca pisîkan ji her işkenceyî xiraptir bû. Qerdiyan bi hopîna me şa dibûn û dikeniyan. Yek ji wan ji hevalê xwe re digot :

- Mêze mêze, çiqas xweşik û rind govend digirin. Herdû jı leyistikvanên baş in. Wele ez bê wan kurê xwe nazewicînim.

Dawiya dawî min li ber xwe neda û min wê kaxizê îmze kir. Piştî ımzê min ji hucrê derxistin û birin hepsê. İmza min li xweşa wan zaf çûbû. Daxwaza wan hatibû cî. Bi işkencê gihîştıbûn armanca xwe...

Li qawişê çavên min vekiribûn. Edî min hawirdora xwe didît. Min anîbûn qawişa gundiyên me. Em çar kes di ranzekî de radiketin. Em di halê xwe de dikeliyan. Serê siban me zû şiyar dikirin û dişandin talîmê. Talim işkenceke mezin bû. Eskeran me didan ber copan. Me di nava hewşa hepisxanê de bazdida, xwe li erdê dirêj dikir û radibûn piya. Me marşên tirkî jiber kiribû. Yên ku bi wan marşan nizanibûn û jiber nekiribûn, diketin işkencexanê. Heta ku jiber nekirina di işkencexanê de diman.

Piştî heftekê mamoste jî anin ba me. Ji min bêtir kesî mamoste nas nekir. Mamoste pirr qels bûbû, mabû hestî û çerm. Berê êvarê qerdiyanek gazî min û mamoste kir. Ez û mamoste çûn qata jor. Em ke-

tin oda albay. Albay dest bi pirsa kir û got :

- Mamoste, ez dixwazim tu ji min re rastiyê bêjî. Ez soz didim te, ezê te berdim.

- Baş e, mamoste gote Albay. Ezê ji te re rastiyê bêjim.

- Navê partiya te çi ye, mamoste ?

- Partiya min tune Albay.

- Tu rast nabêjî mamoste.

- Belê, ez rast dibêjim.

- Te li gund bi kurdî dersa zarokan û xortan daye. Ma ev jî derew e, mamoste ?

- Ev rast e Albay, mamoste got. Çinkî kurdî zmanê zikmaka wa ne. Zarok ji zmanê tirkî fêm nakin.

- Ma tu nizanî ku kurdî qedexe ye ?

- Meriv bi qedexan nikare zmanekî ji ortê rake Albay.

Albay hêrs bûbû. Ji çavên wî agir dipekiya. Tirsa dilê wî hatibû serê wî.

- Baş e, Albay got. Te çima ala dibistanê şewitand ?

- Min ala dibistanê neşewitandiye. Hun li min îftira dikin.

- Te pêşmergan di mala xwe de veşartiye û te birînên wan tedawî kiriye. Te wan biriye ser tixtor jı. Karî tu navên wan tixtoran bêjî min ?

- Haya min ji van tiştan tune Albay.

- Tu derewa diki mamoste, Albay got. Di destê min de ispat hene. Fermo vî kaxizî bixwine.

Kaxizê ku Albay da destê mamoste, kaxizê ku min îmze kiribû, ew bû. Mamoste bi dengekî bilind wî kaxizê xwend û li min mêze kir. Ev tiştên

Institut kurde de Paris

ku Albay li jor pirs dikir, tê de hebûn. Yani min bi destê xwe mala mamoste şewitandibû...

Ez ji nişka ve qêrîyam û min got :

- Ev tiştên ku di kaxizê de hatine nivisandin derew in. Qerdiyana bi darê zorê bi min dan îmze kirin. Tu suçê mamoste tune ye. Polîs van tiştan ji ber xwe çêkiriye. Ez wan tiştan qebûl nakim.

Albay gazî çend eskeran kir. Esker bi çepilên me girtin û me birin qawîşê.

Kela min rabûbû. Kerba min ji min dihat. Min ji mêraniya xwe fedî dikir. Mamoste dilê min distand û moral dida min. Min heya îro mêrekî wek mamoste nedîtibû...

Dotira rojê qerdiyana dîsa gazî min û mamoste kirin. Em çûn qata jêr. Yuzbaşîkî bi alê me ve hat. Yuzbaşî bi destê mamoste girt û got :

- Mamoste, tu û ev xortê ha, hun pirr qirêj bûne. Albay emir da min ku ez we bişeynim hemamê.

Gotinên yuzbaşî kêfa me anî. Bi rastî cilên me tijî sipî bûbûn. Ji xwirandinê xew bi çavên me nediket. Hesreta me tasek ava sar bû. Yuzbaşî kete pêşiya me û em çûn. Em ji koridora ku me tê de işkence kiribûn derbazdibûn. Yuzbaşî derê odekî vekir û eskeran me daf da. Ode tarî bû, bîna gû û mizê jê dihat. Eskeran dafekê din li me xist û em ketin nava avê. Av tijî gû bû. Lexima hepisxanê di vir de derbasdibû. Me xwe avêt derve. Lê eskera me dan ber pehinan û em dîsa ketin nava gû. Esker bi porê me digirtin û me niqo dikirin. Ava bi gû, bi kurm û bi kêzik, dev û pozên me tijî dikir. Em di nav gû de mabûn. Soberiya gûyê nîv seet ajot. Ew

jî êdî ji bına gûyê aciz bûbûn. Ez û mamoste li erdê vezelîbûn. Eskera çend teneke ava sar li me kirin û çûn. Ava sar hinek bîna me derxist. Mamoste ji min re got :

- Hevalê delal. Çi dibe bila bibe, meriv gelek xwedî bawer be. Heta îro tu gel welatê xwe bê zindan, bê kuştin û işkence Azad nekiriye. Tu gere li berxwe bidî...

Min bi dil û can gohên xwe dida mamoste.

Piştî nîvro qerdiyan hatin ba me. Ji me re xwarin anîbûn. Lê me xwarina wan nexwar. Kî dikaribû di nav gû de xwarin bixwe... Lê qerdiyan bi zorê dan me. Bi lokma pêşî ma dest bi vereşandinê kir. Vereşandina me li xweşa wan çû. Qerdiyan bi kefçiyan ji leximê gû tanin û dixistin qirika me... "

Diya min dest bi girînê kiribû. Dadê çend car vereşiya û çû tuwaletê. Dadê peyva Reşo birri û got :

- Bes e Reşo, ez êdî tehamul nakim. Ji min re bêje, mamoste dijî an na ? A giring ev e.

- Belê, mamoste dijî, Reşo got. Ez dixwazim hun biçin dîtina wî. Ew di hepisxanê Diyarbekirê da ye.

Mizginiya Reşo dilê me şa kir. Ez û Azad jî çûn ba wan. Diya min ji Reşo pirsî :

- Baş e Reşo. Ma te çawa berdan ?

Pirsa dadê wek gullekî kete zikê Reşo. Reşo serê xwe xist berxwe û bersiva diya min neda. Rabû piya, xatir xwest û çû.

Reşo dawiya dawî teslim bûbû û li ser bavo ifade dabû. Ji bo vê yekê gundiyan jê nefret dikir. Diya wî şırê xwe lê heram kiribû û wî ji malê avêtibû.

Institut Kurde de Paris

Dergistiya Reşo, gustila nişaniyê avêtibû nava çavên wî û nişaniya xwe xira kiribû. Li gund tu kes pê re nedipeyivî. Reşo bûbû wek marê reş di nav gund de. Xelqê bi çavên tolazan lê mêze dikir. Ciyê kesên tirsonek û bêbext li ba wan tunebû. Tol standin û mêrxasî di nav wan de ji hezaran salan vir de dihat...

Rojek Reşo winda bû. Bi rojan kesî wî nedît. Piştî hefteyek, gundiya cendekê wî ji axurê derxistin. Reşo xwe daleqandibû. Diya Reşo neçû ser gora wî...

Çiroka Reşo bûbû guwareke zêr û ketibû gohên xortan...

Institut kurde de Paris

# DADÊ DİGİRİN

Piştî peyvên Reşo, ez kerr û lal bûbûm. Min her şev di xewna xwe de bavo didît û digiriyam. Dadê bi halê min pirr dêşiya. Jê kiri ku ezê din bibim û bi çolan kevim. Ji tirsa min xew bi çavên wê nediket. Me dixwest, em biçin Diyarbekirê ba bavo. Lê dadê newêribû. Dadê ji eskeran pirr ditirsiya û nedixwest ruyê wan bidîta. Diyarbekir bajarekî mezin bû. Emê tê de winda bibûna. Nasên me li wir tune bûn.

Rojekî Apê min Temo hate mala me. Apo ji me re hinek pere anîbû. Mele dikana xwe girtibû. Rewşa me roj bi roj xiradibû. Gundiya alikariya me dikir. Lê gundî bi eşkere newêribûn bihatina ba me. Tim bi dizî dihatin. Eskera wan tirsandibûn. Subay ji wan re gotibû, yên ku biçe mala mamoste, an jî alikariya wan bike, ezê mala wan talan bikim û wana têxim hepsê.

Lê gundi dîsa jî, me tenê nedihiştin û dihatin ba me.

Radiyo her roj gelê me tehdit dikir û digot : " Yên ku alikariya terorista bike, wan veşêre, xwarin û vexwarinê bide wan, ê bên ceza kirin... "

Esker carna dihatin gund û me tehdît dikirin. Çavê hikumetê tim li ser me bû.

Apê min Temo ji berîka xwe rojnamekî derxist û nişanê me da. Di rupela pêşî de resmê bavo û yên

Institut kurde de Paris

hinekê din hebû. Apê Temo got ku, rojname dinivisıne ku bavê we û çend mehkuman, ji hepsê firar kirine. Hikûmet çaralî li wan digere.

Dengûbahsên Apo, me şa kir. Ruyê dadê keniya. Apo hinek şîreta lê kir û gotê :

- Tu gere van rojan hay ji xwe hebî. Bala hikûmetê ser te ye. Bi kesî re nede û nestîne. Ji bira xwe mebe, firarkirina mêrê te, ne tiştekî piçûk e. Hikûmet wê heyfa wî ji te derxe.

Apo li ba me bi dûrûdirêj nesekinî û çû. Jiyan me dabû ber qamçiyên xwe û bi me dileyîst. Em bûbûn esîrên wê. Ji destên me tiştek nedihat. Pêşiya me, ne ronahî bû. Em di nav taritiyê de mabûn. Min carna ji dadê dipirsî :

- Dadê, ma em çima naçin ba pîrika min ?

Dadê bersiva min dida û digot :

- Nabe Hêlîn. Heqe me tuneye ku em serê wan jî têxin belayê. Ka em mêze kin, wê çi bê serê me. Em carek terpilîne, lê em gere berxwe bidin...

Serê sibekê gund bi dengê trembêlan şiyar bû. Bi sedan esker avêtibûn ser gund û mal bi mal digeriyan. Berê gundiya dabûn meydanê. Tepûrepa copên wan bû. Vêcar ne li me tenê, li dewar û pez jî dixistin. Kûçikên gund êrişê wan dikirin û xwe davêtin ser wan. Eskera bi qondaxê tivingên xwe li wan didan û xwe diparêstin. Çawîşek dest avête demança xwe û berî wan da. Uzzze uzzz bi kûçikan ket û reviyan. Du heb ji wan bê can ketin erdê. Edî kûçikên me jî, ji xezeb û işkenca hikûmeta Tirk ne bê par bûn.

Em li meydanê kom bûn. Yuzbaşî yeko yeko

Institut kurde de Paris

gazîme kir û pirsî :

- Mamoste li ku ye ? Tu cîyê wî dizanî an na ?

Bersiva me teva wekhev bû :

- Naxêr, ez nizanim.

Agir ji devê yuzbaşî dibariya. Demança xwe tazî kiribû û fişek dabû berê.

- Ezê we teva bikujim, Yuzbaşî gote me. Hikûmet vê heqê daye min. An hunê ji min re rastiyê bêjin, an jî hun ji destê min sax nafilitin.

Lê Yuzbaşî bi zirtên xwe ve dima. Gundî bersiva wî nedidan û devên xwe qul nedikirin. Tehtidên Yuzbaşî li hewa diçû. Esker ketibûn nava pangan, axuran, koxikan û li bavo digeriyan. Kewaran qul dikirin, çalan vedikirin. Lê tiştek bi destê wan nediket. A rastî, gumana me û gundiyan jî, ji bavo tune bû. Kesî bi ciyê wî nizanibû. Feqet Yuzbaşî ji me bawer nedikir.

- Ez we baş nas dikim, Yuzbaşî digote me. Ma hun ne Kurd in ? Di navbera we û lawiran de ferq tuneye. İnyada we meşhur e. Hun zû bi zû tiştan nabêjin. Lê ezê îro ecêban bînim serê we. Hun min baş nas nakin. Ez merivekî bê Xwedê me... Li ba min merhamet û wijdan tuneye. Ez goştê insana xav dixwim. Ezê zarokên we şerjêkim û goştê wan bi qelinim.

Yuzbaşî nefreta xwe divereşiya. Neyarê ortûocaxa Kurdan bû. Ger jê bihata ewe me teva bişewitan da.

Eskerek bi milê diya min girt û anî ba Yuzbaşî. Dadê ji tirsan lêvên xwe gez dikir û digiriya. Yuzbaşî pehinekî li tenişta wê da. Dadê serpiştkî qeli-

bi û axîn kir. Xortekî, xwe nêzî Yuzbaşî kir û kulmekî li nav çavê Yuzbaşî da. Yuzbaşî, ji ciyê xwe pekiya, serqunki li erdê ket û ma. Xort xwe avêt serî û devê xwe xist qirika wî. Çavên Yuzbaşî beloq bûbûn. Eskera, Yuzbaşî bi zorê ji lepê Şêrko derxistin û wî dan ber copan. Bi copan li serê Şêrko didan, xwîn jê diherikî. Di nav pênc deqan de roh lê nema bû. Eskera bi çepilên wî girtin û avêtin nava qamyonê. Çavên Yuzbaşî werimî bûn, bûbûn wek balonê...

Piştî nîvro eskera diya min kelepçe kirin û wê xistin cibê. Ez û brayên xwe, me da pey wan. Qareqar ji dadê dihat. Em di nav tozûtelazê de mabûn. Çavên me tijî xweli bûbûn. Gundiya, me bi zorê zift kirin û anîn malê... Em êdî tam sêwî mabûn. Ne dê, ne jî bav... Hikûmet herdûkan jî, ji me standibû. Karûbarê malê mabû di stoyê min de. Carna Emo bi dizî dihat malê û ji me re xwarin çêdikir. Emo dostê rojên teng bû. Emo, ji me re bûbû wek dê. Hebûna wê bîna me derdixist...

Di navberê de çend hefte derbaz bû. Şevek li deriyê me xistin. Bi şev, nivê şevê, ji me çi dixwestin gelo ? Herhal êdî dora min jî hatibû. Min derî venekir. Lê sekin bi wan neket. Dawî ez mecbur mam û min derî vekir.

- Netirse, em hevalên mamoste ne, yekî ji wan gote min. Me ji were xwarin û kincan aniye.

Bi çek û rext bûn. Bi min re hêdî dipeyivin. Yek ji wan egala xwe vekir û keniya. Min wî derhal naskir. Ew ji gundê me bû. Xortekî pirr baş û mêrxas bû.

- Mereqa bavê xwe meke Hêlîn, xorto gote min. Bavê te sax e û destê hikûmata Tirkan, zû bi zû nagihêje wî.

Li ba me qederek runiştin. Berê sibê ji me xatir xwestin û çûn. Hatina wan dilê min tijî hêvî kir. Em hewqas jî ne bê xwedî bûn.

Xortên me pirr dilsoz û mêrxas bûn. Ew û eskeran pirr caran bera hev didan.Esker ji wan zaf ditirsîyan. Xortên me ji destên xwe re baş bûn. Fişekên xwe vala û pûç nedavêtin. Bûbûn melkemotê eskeran. Qontrola gund, piştî rojavahiyê diketa destê wan. Mêraniya wan ketibû kilam û sitrana. Li her derê Kurdistanê hevalên wan hebûn. Xwe di çiyan û şaxan de vedişartin û şerê xwe dikirin.

Piştî sê hefteya, dadê derket hat. Me dadê zor nas kir. Dadê temamen goriyabû. Wek meriv mirîkî ji gorê derxe, ew jî wisa bû. Çavên wê werimî, pişta wê xûl bûbû. Ji birînên wê xwin dihat. Bi agirên cixaran dadê şewitandibûn. Levên wê qelişî bûn, piçka xwînê di wan de nemabû. Ji lêdanê laşê wê şîn û reş bûbû. Dadê mabû çerm û hestî... Serê wê gêj dibû û direhilî...

Me xwe avêt ser dadê û em giriyan... Quriniya me newalan, çiyan, çeman tijî dikir. Dadê ji girînê têr bûbû. Min bi destê wê girt û jê pirsî :

- Ev çi halê te ye dadê ? Ka bêje, çi bi te kirin?

Dadê bi çavekî xemgir, şikestî û şermî li mi mêze kir û got :

- Ma ezê çi bêjim Hêlîna min. Qey tu halê min nabinî, keça dadê ? Dev ji min berde û here razê.

Bersiva dadê min têr nekir. Dadê gere ji min re

Institut kurde de Paris

rastiyê bigota. Ku dadê, ji min re jî nebêje, ma wê ji kê re bêje gelo ? Ji me pêve kiyê wê hebû. Dadê dikaribû îşev jı bimra. Ji bo vê yekê min pêsîra wê berneda.

- Dadê, ez qurbana te me, min gotê. Tu ji min re rastiyê bêjî.

Dadê kir û nekir xwe ji min xelasnekir. Dawî mecbur ma û got :

- Hêlîn, keça diya xwe... Rebenê, pepûkê, bêkesê. Dijmin dijmin e. Dijmin çi bînin serên hev, wan jî ew anîn serê min. Lê tiştek ji bîr neke ; Li qereqolê ez ne tenê bûm. Bi dehan keç, bûk û jinên Kurdan jî li wir bûn. Ew jî wek min, jin, xwişk û diyên welatparêzên Kurdan bûn. Ji sibê heya êvarê li me işkence dikirin. İşkence çeşît bi çeşît bûn. Tazî kirin, birçî hiştin û dest avêtin, jiyana rojê bû. Keçên xama pîs dikirin û li ber çavên me dest davêtin wan. Eskeran nîvê şevê dihatin ba me û me dibirin odên xwe. Yên ku dixwestin li berxwe bidin û neçin, diketin işkencexanê. Bi kurtî, em reyin mabûn di destê wan de. Ji me, mêrên me dixwestin. Bi kurdî peyvandin qedexe bû. Pirraniya me, ji kurdî pêve bi tu zmanî nizanibû. Eskera ji me re digot :

- We vî zmanê pîs ji ku aniye ? Hun çima bi tirkî nizanin û napeyivin...

Ji wan kiri ku, me zmanê xwe ji dikana bi peran kiriye.

Piştî gotinên dadê em raketin. Serê sibê hê roj navêtibû, dadê min şiyar kir û got :

- Hêlîn, ez pirr ditirsim ku ew werin te jî bibin.

Institut kurde de Paris

A çêtir ew e, ku tu serê siban zû biçí mala metika xwe Seyro û li wir rakevi.

Min daxwaza diya xwe ani cî. Ez her serê siban diçûm mala meta Seyro û li balê dimam. Meta Seyro jinebî bû. Ji me zaf hes dikir. Jineke şiyar û dilsoz bû. Demança wê tim di paşila wê de veşartî bû. Tu kes newêribû bela xwe lêxista. Jineke mêrane bû.

Metika Seyro, ji me re tim digot :

- Xortên îro beredayî ne. Xortên ku nikaribin dê û xwişkên xwe di hemberê dijmin de biparêze, heqê wan û zewacê tune ye.

Qereqol deh roj mihlet dabû dadê. Dadê gere di nav deh rojan de bavo teslimê wan bikira. Nexwe wê dadê dîsa bibirana qereqolê û têxistana bin işkencê...

Rojên bi hijmarê zû derbas dibin. Ji bo me roj bûbûn wek seetan. Melekê mirinê, li hawirdora me diçû û dihat. Lê meta Seyro di ber dilê me dida û digot :

- Netirsin. Hunê rojekî ji destê van bênamûsê eskerên Tirkan xelas bibin. Bi min jî mabe, ez we teslîmê wan xwînmijan nakim...

Institut kurde de Paris

# EM Jİ GUND DİREVİN

Di navberê de heşt roj derbaz bû. Melkemot hêdi hêdi xwe nêzî me dikir. Ji vê gavê ve, me çavên Melkemot, yên bi tirs û bi xwin didît. Em ketibûn taya mirinê. Diya min serê me teva şuşt û kincên me yên paqij li me kir. Piştî du rojên din, wê dadê dîsa winda bibûya. Ditîna me û wê, wê bima roja qiyametê. Me hevdû helel kiribû...

Şevek, şeveke havînî pirr dereng, li deriye me xistin. Ew şev neh rojên dadê qediyabû, em ketibûn roja deha. Bi repîna derî em tevde şiyar bûn. Dadê cilê xwe li xwe kir û çû bi alê derî ve. Hinek sekinî li me mêze kir. Tiliya xwe avêt çengelê û xwe paşve da. Me Apê xwe Temo zû nas kir. Tivinga Apo di destê wî de diçilwilî. Nifrîn û agir ji ruyê wî dibariya.Çavên wî tijî xezeb û kîn bûn. Li erdê çarmergî rûnişt, tivinga xwe danî ser çokên xwe. Qutiya cixare ji cêba xwe derxist û cixarekê pêça. Cixara Apo, wek lûla sobê, ode tijî duman kir. Apo nefes ser nefesê li cixara xwe dida û pif dikir. Destê wî, yê bi cixare dilerizî. Tilikên Apo, li ser lêvên Apo nedisekinîn. Ji me deng dernediket. Apo çîroka dadê ji hineka sa kiribû...

- Zû kin, Apê min gote me. Emê işev ji vir herin. Esker ha hat, ha hat... Em êdî nikarin zarûzêçên xwe, namûsa xwe di bin piyên eskeran de bihêlin.

Dadê bi destekî sivik, tiştên ku ji me re pêvîs

Institut Kurde de Paris

bûn da hev. Di nav çend deqan de sê boxçe hazir kir. Livîn, sandoq, firaq û tiştên giran di ciyê xwe de man.

Apo derket derve, çû nava gund û ziviri. Bi dest ji me re işaret kir. Em ji malê derketin. Şev tarî bû. Çav çavan nedidît. Giraniya şevê wek perdekî reş kişiyabû ser me. Haya tu kesî ji me tunebû. Tarîtî me xistibû zikê xwe û veşartibû. Stêrk di nav tarîtiyê de êdî jı geş bûbûn û diçilwilîn. Carna yek ji wan difiriya û ciyê xwe digohirand. Me ji wan re digot sitêrkên bi dûv. Koma sêwîya xwe berdabû ser newalê û diçirisî. Pîrika min digot ; sitêrk zarokên esman in. Ew jî dimirin, dikenin, digirîn, şa dibin...

Em nêzî newalê bûn. Gund di nav tarîtiyê de mabû. Em berjêr diçûn. Newal devê xwe wek dêwekî vekiribû. Em carna kaşdibûn, diterpilîn, diketin. Giya, sitrîn, kevir, gezik li ber çavên me dibûn wek lawiran, wek cinan, wek pîrebokan... Ji me kiri ku me di jiyana xwe de, vê newalê hîç neditîbû. Halbukî jiyana me li vir derbaz bûbû. Lê ruyê tarîtiyê ruyekî ne xweş e, ruyeke bi tirs e. Di tarîtiyê de her tişt dikarin bên serê meriv. Mezinên me beredayî negotibûn : " Pişta xwe nedin kesên tarî ... " Yani merivên du ru, bêbext û zalim...

Apo ketibû pêşiya me û em dimeşiyan. Ji nişka ve hestekî çirisî, şewq da. Em veciniqin, me xwe avêt erdê. Apo bi hesta xwe bersiv da û got :

- Netirsin, heval in. Ewê alikariya me bikin û wê bi me re bên.

Çar kes bûn. Bi çek û rext bûn. Yek ji wan

Institut kurde de Paris

Bêrivanê da pişta xwe, ên din jî bi destê birayê min girtin û em meşiyan. Destê min û Azad di destê hev de bûn. Em ji newalê derbas bûbûn û me dabû qûntara çiyê. A rastî me nizanibû em bi ku de diçin. Apo ji me re tişteki negotibû. Min bi dengekî nizim ji Azad re got :

- Bîra te tê Azad ? Bavo carna ji me re digot, ez xebata binê erdê dikim.

Azad keniya û bersiva min da :

- Çawa nayê bîra min, Hêlîn ? Ji me kiri ku bavo bi rasti dikete binê erdê. Em jî îşev wek bavo ketine binê erdê. Ma ne wisa ye ?

- Belê, rast e, min gote Azad. Tiştên ku bi dizî tên çêkirinê, dibin tiştên bin erdî. Ger xebata bi dizî tunebûya, kes nikaribû xwe li ber ordiya Tirkan bida. Dê bila di vî şeva reş û tarı de werin me. Wele newêrin ji qula xwe derkevin...

Apo û hevalan, bi peyva min û Azad dikeniyan. Dengê me çûbû wan jî. Apê min destê xwe danî ser pişta min û got :

- Aferin ji we re. Hun ji vê gavê de bi her tiştî dizanin. İşê ordiya Tirka zor e, zehmet e. İro bi milyonan zarokên me şiyar dibin û wê tola me ji wan bistînin...

Dawiya çiyan, dawiya newalan nedihat. Eş ketibû lingên min. Di min de taqet nemabû. Berê ku dinya gewr bibe, em li ber derê şikeftekî sekinin. Berqa zerinî ketibû ruyê esmên. Roj hêdî hêdî serê xwe bilind dikir û çiyan dixist bin hikmê xwe. Apê min û du kes çûn nava şikeftê. Devê şikeftê di giya, qirş û gezikan de mabû. Em li serê çiyakî

Institut Kurde de Paris

pirr bilind bûn. Roj xwe nêzî me dikir. Serma sibê xwe li ber tirêjên rojê nedida û dinya germ dibû. Bi derketina rojê, daran sî da, kevir biriqîn. Tabiat ji xew şiyar bû. Dengê zarokên tabiatê, ji dehl û deviyan, ji newalan, ji qulan û ji şikeftan bilind dibûn...

Piştî qotrolê em ketin zikê şikeftê. Apê min eletirika dest pêxistibû. Hevalan ji derva qirşika anîn. Di torbên wan de her tişt hebû. Nan, penîr, şekir, çay, pîvaz, zeytûn. Apo çaydanê danî ser agirê. Em li hawirdora tifikê kom bûn. Nava şikeftê honik bû. Zarokên me ketibûn xewê, haya wan ji dinyayê tunebû. Belkî jî di xewna xwe de bavo didîtin. Dadê şûşên çayê dani ber me û penîr hur kir. Çay dem digirt. Ji birçîna ûze ûza zikê me bû. Piştî hewqas rêveçûnê zikê me dest bi isyanê kiribû. Dadê şûşan tijî kir. Me bi zilikan çaya xwe li hev da. Ji nişka ve Apê min li pişt xwe zivirî û eletirikê da kûraniya şikeftê. Şewqa eletirikê zikê şikeftê qul kir, tarîtî qelişî paş de çû. Marekî gewr, wek stûnekî, devê xwe vekiribû û pifînî dikir. Li ber marê, dubişkekî reş û xwirt duvê xwe dabû ser pişta xwe û dilepitî... Herdû lawir wek neyarên hezar salî îrîşê hevdû dikirin. Çekên xwe, yên bi jehr û tahlûke nişanê hev didan. Nefreta wan mezin bû. Ne hebûna me, ne jî şewqa eletirîkê bala wan nedikişand. Qerarê xwe dabûn : E yek ji wan bimira. Herhal şikeft têra herdû lawiran nedikir. Mar radibû hicûmê, xwarowiçko dibû, di nav tozûtelazê de dima. Dûbişk bi sivikbûna xwe nediket faqa marê. Xwe baş û bi aqil diparêst. Em ji tirsa lal bûbûn. Ji

Institut kurde de Paris

me kiri ku hawirdora me tev de mar û dubişk in. Apo berê tivingê dabû wan û tiliya xwe danibû ser tetikê...

Şerê wan dirêj ajot. Dawî mar, dubişkê qefalt û wê xiste quncikê asê. Zmanê xwe, yê bi çetel derxist, devê xwe vekir ku bi dûbişkê vede, dûbişk bi sivikî xwe avêt ser pişta marê û pê veda. Serê marê sist bû, mar ricifî, gevizî, perpitî... Mar xwest bi rê keve, lê dereng mabû. Dûbişk ser pişta wî xwe bêdeng kiribû û lê mêze dikir. Ewê neyarekî jı xwe mezintir û zeximtir kuştubû. Şikeft êdî tenê jê re mabû...

Apo da xencera xwe û bi alê wan de çû. Diya min bi şalê Apo girt û gîrîya :

- Em ji vir herin, diya min got. Ez pirr ditirsim. Mar û dûbişkên vê şikeftê xelas nabin. Ez naxwazim, ez û zarokên xwe bibin xwarina mar û dûbişkan.

Apê min Temo keniya û got :

- Ma tu dîn buyî keçê... Ka ji bo me tu derên bê tehlike, bê tirs hene gelo ? Tehlika me bi me re ye. Ji bira xwe nebe, em mahkûmê hikûmetê ne em gurê serê çiya ne. Bi baweriya min, mar û dûbişk ji eskeran çêtirin. Ew zaf zaf dikarin çend hep ji me bikujin. Lê esker ? Ger bi me bihesin, yek ji me sax nafilite...

Apo şûşa xwe teze kir, serê xwe xiste nav destê xwe û got :

- Agir bi mala min nekeve. Ma hewqas jî dîbe ? Tiştên Xwedê pirr ecêb in. Tu li vî hikmetî mêzeke lo ? Dinya tev dijminê mar û dûbişka ne, ew jî

Institut kurde de Paris

dijminê hev in... Baş e, ma çi firq di navbera me û wan de heye gelo ? Ma em Kurd jî eynî tiştî nakin ? Her çar dewletên xwînmij dixwazin me ji cihanê rakin û koka me bînin. Ev ne bes e, inca em jî hevdû dikujin, diperçiqînin û hev xelas dikin... Herhal em û maran, em û dûbişkan pismamê hev in. Kîn û xezeba me li hevdû çûye...

Piştî peyva Apo em raketin. Lê ji tirsa xew nediket çavên min. Çavekî min girtî, yê din vekiribû. Dadê digot, gava lawir hevdû dikujin, xwediyê wan tên û termên xwe dibin. Çavên min tim li kûraniya şikeftê bû.

Em bi dengê helikopterê rabûn. Ew mar û dûbişkê bi perr û bask bû. Apo xwe li ber devê şikeftê dirêj kiribû û bi dûrebinê lê mêze dikir. Li gor rewşê, an me yê şerê xwe bida, an jî emê têketina zikê şikeftê û kûr biçûna.

Roj li ber xatir xwestinê bû. Gelî bi gelî, çiya bi çiya re distand û melûl dibû. Quweta wê êdî nedigihişt çiyayên bilind û ser tûj. Çiyan hindik hindik, perçe perçe, çavê rojê digirtin û xwe ji germa wê xelas dikirin.

Roj çû ava. Bakî honik derketibû. Em hê di şikeftê de bûn. Apo li ber devê şikkeftê sekinîbû û li esmên mêze dikir. Şewqa hîvê devê şikeftê tijî zîv kiribû. Min di jiyana xwe de heya îro tiştekê wisa delal, wisa xweşik û rind neditibû. Di zikê şikeftê de seyra hîvê bê emsal bû. Hebûna hîvê dilê min şa kir, xem û kulê min, kesera dilê min di nav rengê hîvê de mabû. Di bin hîva zîvînê de, çiyan serên xwe dabûn hev û diçirisîn.



Institut Kurde de Paris

Me haziriya xwe û rêveçûnê dikir. Em êdî ne bê dost û yar bûn. Hîv hatibû hewara me. Lê em bi rê nediketin. Hîv ji me bazdida û diçû. Apo carna lê mêze dikir û digot :

- Hîv haziriya xwe û xewê dike. Li ber razanêye.

Peyvên Apo, serê min teklihev dikir. Min jê pirsî :

- Apo, ma em çima naçin ?

Apo li min zivirî û bersiva min da :

- Hêlîn, Apo gote min. Ez dizanim tu çi difikirî. Ma ez ji te re çawa bêjim, keça min ? Gelo ên ku ji hîvê hes nekin hene di dinê de ? Hîva delal, rind û xweşik... Hîv ronahiya dilan, sembola evînê ye. Lê çi feyde Hêlîn ? Hikûmeta Tirka ev hîva delal jı kiriye dijmin û berdaye me. Ew buye casûsê hikûmetê û me taqip dike. Di bin ronahiya wê de, em nikarin ji qulê xwe derkevin û herin. Esker ê bi me bihesin...

Gotinên Apo ketibû serê min. Apo rast digot. Çaraliyê me tijî esker bûn.

Ez pirr cara fikirîme, ku meriv di jiyana xwe da, dikare ji diya xwe, ji bav û birayên xwe bi xeyide, nefret bike û ji wan bi reve. Lê tu car nehatibû bîra min, ku ezê rojekê ji hîvê jî nefret bikim û xwe jê veşêrim. Hîv şahidê zarokbûna min bû. Li gund, çaxê ez li serbana radiketim, min tim lê mêze dikir û dikeniyam. Ez aşiqê wê bûm. Min derdê dilê xwe tim jê re digot û di xew de diçûm. Ez çi bikim... Jiyan xerib e, jiyan zalim e. Ezê hê pirr tiştan bibînim û derbaz bikim...

Ez di nav fikrên xwe de gêj bûbûm.Edî haya min

Institut kurde de Paris

ne ji hîvê, ne jî, ji rêveçûnê mabû. Ez bi dengê Apo veciniqîm. Hîv winda bûbû, çiya ketibûn xewê. Em yeko yeko ji şikeftê derketin. Carna ji ber lingên me kevir radibûn û berjêr teradibûn. Xwişînî bi newalan, bi dahlan diket. Rê pirr asê bû. Gavekê xelet û şaş, dibû bedela jiyana me. Çiyayên tûj, çiyayên bi heybet û bilind pala xwe dabûn hevdû û rê nedidan.

Em berê sibê gihîştin gundakî. Gund di qûntara çiyakî de hatibû ava kirin. Gundekî bi dar û ber bû. Xêniyên gund ne wek ên me bûn. Ji keviran hatibûn çêkirin. Pirraniya wan du qat bûn. Em çûn malekî. Xwediyê malê ji me re xwarin çêkir û danî ber me. Oda em tê de diman, tijî çek û rext bûn.

Me xwarina xwe qedand. Apê min pirr bi kêf bû. Ew û xwediyê malê carna diçûn derve û bi hev re dipeyivîn. Em ji oda mêvanan rabûn û çûn odekê din. Beriya ku emê razên, Apê min hat ba me û got :

- Bê tirs razên. Edî ne mar, ne dûbişk, ne jî esker dikarin we rehetsiz bikin. Gundiyên vir, wan neyaran ji gundê xwe, ji zû de avêtine. Em nêzî hidud in. Li vir hikmê me derbaz dibe, ne ê Tirkan. Ger hun bixwazin biçin nava gund, kêfa we ye. Ji kurmancı pêtir, kesek bi zmanê din nizane.

Em piştî nîvro şiyar bûn. Xwarin hazir bû. Piştî xwarinê em çûn nava gund. Xortên gund li serbana digeriyan û bi dûrebinê serê çiyan, newalan û riyan qontrol dikirin. Çekên mezin û gewre danîbûn serê girikan, nava dehlan û serbanan. Hebûna wan tirsa dilê min kêm dikir û ez bi wan şa dibûm. Carna bi

Institut Kurde de Paris

dehan merivên bi çek dihatin gund îstrehet dikirin, dixwarin û vedixwarin. Kincên wan ne wek ê me bûn. Di nav şal û şapikên xwe de pirr bi heybet bûn. Ez ji çavên wan ditirsiyam...

Em li vî gundî sê roj man. Piştî sê rojan em dîsa bi rê ketin. Çiya yeko yeko winda dibûn. Em ber bi deştê ve diçûn. Deşteke wek kefa destê min ketibû ber me. Rêveçûna deştê, wek rêveçûna çiyan ne zehmet bû. Me bê tirs lingên xwe davêt û em dimeşiyan. Çaraliyê me parêz bûn. Zebeş, petêx, şemamok, qetik, deştê xemilandibûn. Me bi gora dilê xwe wan dida ber gezan û dixwar. Ez êdî jî bîna şemamokan, ji tama zebeşan û ji xwarina petêxan têr bûbûm. Eşa lingên min di nav wan de winda bûbû.

Institut kurde de Paris

# HİDUDÊ Bİ MAYİN

Dotira rojê serê sibê em hatin gundekî. Gund di nav deştê de hatibû ava kirin. Xêniyên gund ji kelpîçan hatibûn çêkirin. Em di nav rêxên dewaran de mabûn. Çêlek, ga, ker, gamêş li duhev rêz bûbûn û berê xwe dabûn çolê. Gund di nav tozûtelaza wan de fetisî bû.

Em hatin ber xanikî û sekinîn. Apê min û xwediyê malê kêfxweşî dan hev. Em ketin hundir. Xwediyê malê mast, dew, to û penir danî ber me. Binekî xweş ji nanê tenûrê dihat. Me taştiya xwe xwar. Piştî taştiyê, ez û birayên xwe çûn odekî din û ketin xewê.

Piştî nîvro gava ez şiyar bûm, min Azad nedît. Deng ji oda din dihat. Zarokên me û dadê hê şiyar nebûbûn. Ez derbasê oda din bûm. Azad li wir bû. Apê min û xwediyê malê bi hev re dipeyîvîn. Gava xwediyê malê, xalê Gundî çav bi min ket, keniya û got :

- Roj baş Hêlîn, tu çi zû şiyar bûyî. Min digot ka ê tu heya nivê şevê rakevî.

Min ji şerma; serê xwe xist ber xwe û rûniştim. Apê min gazî min kir û got :

- Hêlîn, ma tu dizanî ku em nêzî hidûd in. Aliyê din Suriye ye. Bîra te tê, me jê re digot Xeta Fransiz. Emê işev derbasî wur bibin.

Apê Gundî fêm kir ku ez tê nagihijim, peyva

Institut kurde de Paris

Apê min birrî û got :

- Hunê sibê êdî ji Tirkan xilas bibin. Emê işev we derbasî Suriyê bikin û bizivirin.

Gotinên Xalê Gundî jı nekete serê min. Ez mat mabûm. Azad destpêkir :

- Keçê, emê işev bi dizî derbasî wi alî bibin. Lê çûyina wir ne hêsan e. Em gere pirr diqat bikin. Dengekî piçûk dikare bibe sedema kuştina me teva. Hidûd ji serî heya binî mayinkiri ye. Bi hezaran cenderme û esker dewriye digerin û nahêlin tu kes derbas bibe. Pirr cara mayin diteqin û meriv di nav şovê mayinan de perçe perçe dibin.

Apê min bi Azad re xeyidî û got :

- Bes e leqeleq bike Azad. Tu kî ditirsînî ? Wele Hêlîn ji te bi zirraftir e. Emê işev jî, xwe xelas bikin, wek şevên din. Hêlîn gohê xwe nede Azad. Ma tu wî nas nakî. Tu dizanî ku Xalê Gundî, bost bi bost, kortik bi kortik van hidûdan nasdike. Xalê Gundî buye mamostê hidûdan. Cenderme xwe li ku diveşêrin, panzer kingê tên, mayin li ku ne, bi teva dizane. Jiyana Xalo di wî riyê de derbas bûye. En ku bi Xalê Gundî re hevaltiyê dikin, ji melkemot, ji mirinê, ji cendermên Tirkan dûr in...

Xalê Gundî nêzikê pencî salı bû. Simbêlê wî ji dumana cixaran zer bûbû. Merivekî kinik û tijî bû. Meriv ji çavên wî ditirsiya. Cixara wî tim di devê wî de bû. Xwediyê sê jinan bû. Xalo bi hejmara zarokên xwe nizanibû. Carna navên wan teklihev dikir.

Evar zû hat. Garan ji çolê dizivirîn. Gund li navhev ketibû. Dengê kûçikan, dengê çêlekan, zirrîna

keran xwe li Berriyê dixistin. û di ser mayinan de diqelibî, winda dibû. Gundî ketibûn karûbarên xwe. Haya kesî ji me tunebû.

Piştî şîvê ez û Azad çûn nava gund ba zarokan. Ji çûyina me re hê wext hebû. Em lihêviya ava bûna hîvê bûn.

Em bi zarokên gundiyan re ketin leyistekê. Em bi çavberdokê dileyistin. Carna dengê tivingan dihat me. Ez û Azad di ciyê xwe de çik diman û ditirsiyan. Lê zarokên gundiya hînê van dengan bûbûn. Ev tişt ji bona wan normal bû. Ez bi alê Şivan de çûm û min jê pirsî :

- Ev çi deng in Şivan ? min gotê.

Şivan kurê Xalê Gundî bû. İsal ketibû sala çarda. Kurukekî pirr nahs û jêhatı bû. Ez û Şivan li ser diwarekî rûniştin.

- Dengê tivingên cendermên Tirkan e, Şivan gote min. Carna beredayî fişekan berdidin ku merivan bitirsînin. Yani ku kes newêribe derbasê Suriye bibe. Carna jî ew û merivên ku dixwazin derbas bibin, li hev dixin. Cenderme çalan vedane û xwe di nav wan çalan de vedişêrin. Di navbera her çalî de sed, an jî dused metre heye. Carna cenderme di tarîtîyê de bi dengekî bilind dipeyivin û dibêjin :

- Bisekine, neçe. Ez te dibînim. Ezê bera te dim. Mereve.

Şivan hem dipeyivî, hem jî dikeniya.

- Cenderme ji Kurdan pirr ditirsin, Şivan digot. Kezeba wan ji me diqete. Çunkî yên ku derbaz dibin, ew jî bi çek in. Ew û cenderme carna bi seetan li hev dixin û ji hev dikujin. Ji bona vê yekê, cen-

derme deng dikin ku kes bi ser wan de neçe û neterpile. Ew ji şer naxwazin û ji mirinê ditirsin.

Birastî heqe cenderma hebû. Ma kî ji mirinê natirse ?

- Ezê jî wek bavê xwe bibim qaçaxçî, Şivan digot. Lê ez hê piçûk im.

Azad jî hatibû ba me. Peyvên Şivan li xweşa wî diçû. Azad gohên xwe bel kiribû û li Şivan mêze dikir. Şivan digot :

- Beriya 12 ê İlonê, yanî beriya cuntayê derbasbûna hidûdê hewqas ne zehmet bû. Pirr caran ez jî, bi bavê xwe re derbas dibûm. Lê vê gavê pirr zor e. Hikûmet naxwaze ku çivîkek jı ser hidûd de derbas bibe û bifire. Hejmara cenderman zêde kirine. Panzerên nû anîne ber hidûd. Hikûmet baş dizane ku welatparêzên Kurdan her şev di van hidûdan de derbas dibin. Daxwaza hikûmatê ew e ku, wan bigire û bikuje. Ji bona vê, cenderme wek ewilî çavên xwe nagirin û merivan zû bi zû derbas nakin. Bo ku ew jî, ji aliyê kumandanên xwe ve tên ceza kirin.

Dilê min li ber sekinandinê bû. Min lêvên xwe gez dikir. Peyvên Şivan di min de hal nehiştibû. Yanî işev emê ber bi mirinê de biçûna... Ev cara çenda bû ? Ma mirinê ji me pê ve kesı nedidıt ? Qey qiyamet li serê me tenê rabûbû. A çêtir ew e ku em li vî gundî bimînin. Min bi destê Şivan girt û got :

- Ez dixwazim ku em li vir bimînin.

Şivan madûmirûskên xwe kir û got :

- Ez naxwazim te bitirsînim Hêlîn. Hewqas jî tir-

Institut Kurde de Paris

sonek mebe. Tu keça Kurda yî. Keçên Kurda wek şêra ne. Ewên ku derbas dibin, pirraniya wan xwe ji destê cenderman xelas dikin û digihîjin armancên xwe. Hun jî wek wan. Lê hun nikarin ba me bimînin. Ger ku kesên tên gundê me, li ba me bimana, di gund de ji me re wê cî nema... Ji bîr meke Hêlîn, cendermên Tirka carna tên gund û li cuzdanên me mêze dikin. Kî xwediyê çend zaroka ye pê dizanin. Lîsta gund bi wan re ye. Lê bi şev newêrin werin gund. Gundî xwedî çek in.

Peyvên Şivan di serê min de pirr tiştan şiyar dikir. Şikefta bi mar û dûbişk, roja ku eskeran avêtibû ser gundê me, mala Meta Seyro... Hasilî jiyana min wek şerideke filmê di ber çavên min de derbas dibû. Belê, bi kuştin û bi hiştin, emê işev derbasê Suriyê bibûna. Çara me tune bû. Paşve zivirin mimkin ninbû. Pişt û pêşiya me wek hev asê û bi tehlike bû. Ha meriv paş de zivirî û mir, ha pêş de. Herdû jî wekhev bûn...

Şivan bi halê min pirr dêşiya. Ji bona vê, Şivan dixwest hinek moral bide min.

- Hêlîn, aliyê din ji vir xweştir e, Şivan gote min. Di navbera gelê vir û wir de ferq tune ye. Ew jî wek me Kurd in. Nivê pismam û nasên me li wan gundan dijîn. Gorra kalik û pîrika min li Qamişlo ye. Ez pirr caran diçim û têm. Di rojên vekirî û sayî de meriv dikare hevdû bibîne. Sibê ez û te, em dikarin ji hev re dest bikin. Ez soz didim te Hêlîn, ezê sibê nîvrokî derkevim serbanê û çavrêniya te bikim. Ma tu naxwazî Hêlîn ?

- Ez çawa naxwazim, min gote Şivan. Ger ku ez

Institut kurde de Paris

heya sibê sax bimînim, ezê ji te re dest bikim. Soza min soz e Şivan. Lê ez ne bawer im ku ezê sibê li dinê bim...

- Hewqas jî tirsonek nebe lê, Azad gote min. Xwedê kerim e. Ez wisa bawer im ku emê bikaribin sax selîm derbas bibin. Ma ev cara çenda ye ku em û mirinê laqên hevdû tên ? Wisa xwiyaye ku mirin ji me ditirse. Dike nake newêre xwe li me bide. Ez dizanim, wê mirin işev jî li dora me here û were, lê hewqas... Hertişt bi me ve girêdayî ye. Em gelek pirr hêdî û bê deng bimeşin. Ezê weka maran bi ser zikê xwe de biherikim.

Ez Azad baş nasdikim. Azad tim dixwaze ku li ba zarokên mezin peznê xwe bide û quretiyê bike. Lê a rastî, Azad jî wek min ditirsiya û dilerizî. Melkamot ji ber çavên wî nediçû. Lê dîsa jî xwe li mêraniyê datanî û ji mêraniya xwe nedihat xwarê...

- Baş e min gote Şivan. Ma em nikarin di derekê bê tehlûke de derbas bibin ?

Şivan keniya û bersiva min da :

- Her der wekhev e Hêlîn, Şivan gote min. Hidûd ji serî heya binî mayin e, têle, qereqol e...

Rastî Şivan pirr zane bû. Bersiva her pirsî li balê hebû. Ji çend bavan vir de qaçaxçî bûn. Heta îro bi dehan pismamê wan hatibûn kuştin. Pirraniya wan seqet mabûn. Lê dîsa jî dest ji vî karî bernedidan. Çunkî idara wan li ser mirinê ava bûbû...

Apê min digot, ev hidûd şêst sal berê hatibûn kişandin. Aile perçe bûbûn, xwişk û bira, dê û zarok ji hev qetiyabûn. Dewletên ku Kurdistanê di nav xwe de parkirine, nahêlin ku Kurd derbas bibin û

hevdû bibînin. Ji bo vê yekê, her sal bi sedan kes tên kuştin û seqet kirin. Bi hezaran kes jiyana xwe di hepsan de derbasdike.

Şivan wek mamostekî bi van tiştan dizanibû. Ji vê gavê ve talîm didît û xwe peş de dibir.

- Yekê ku bixwaze bibe qaçaxçî, gelek bi van tiştan bizanibe, Şivan digot. Esker xwe li ku derê diveşêrin, mayin çiqas ji hev dûr in, nobet kingê tên guhartin, kortik li ku ne ? Dengê panzer û cîban ji ku tên ? Beriya cuntayê me pirr caran pez û dewaran jî derbas dikir. Carna me rişwet dida subayan û em di ber qereqolan de diçûn. Xasma subay û cendirmên ber hidûdan pirr hînê rişwetê bûne. Ji bona pera dikarin jinên xwe bifiroşin. Lê hinek ji wan zaf xain û pûşt in. Hem pera digirin, hem jî kesan dikujin. Yên wisa zû tên nas kirin. Jiyana wan kurt dajo û tên kuştin...

Par hinek li ser hidûd hatin kuştin. Deh kes bûn û dixwestin derbasî Suriyê bibin. Bi serê xwe hereket kiribûn û xeber nedabûn me. Her deh jî politik bûn. Lê xeribê hidûd bûn. Esker bi wan dihise û wan dide ber fişekan. Rastî em ji bona wan pirr dêşiyan. Deh kes dikare bi ordiyek re şer bike. Lê çi feyde ?

Rast e, em ji xelqê pere distînin. Lê em wan ji kuştin û ji girtinê jî xelas dikin. Ma ku em pere negirin, emê çawa bikaribin idara xwe bikin û çekan bikirin. Lê bavo ji merivên politik kêm pere distîne. Carna jî qet nastîne û wan belaş derbas dike. Bavo dibêje, ku Kurd ji destê Tirkan û yên din xelas bibin û welatê wan çêbe, êdî ev hidûd jî namî-

Institut kurde de Paris

nin.

Şivan, tim van tiştan ji me re bi dengekî nerm û germ digot. Bê heyecan, bê tirs... Kuştina apê wî, kuştina dosta li balê pênc pere nedikir. Şivan rehet û sade bû. Ev jiyana bi xwîn û zahmet, jê re wek çîrokan dihat...

Rastî ez li Şivan heyrî mabûm. Meriv çawan dikaribû van tiştan bi rehetî, bê girîn bigota. Peyvên Şivan ez ditirsandim. Dilê min lihev diket, sancî ketibû zikê min. Tiştên ku heta îro hatibûn serê me, li ber peyvên Şivan sivik diman...

Hîv hêdî hêdı ji me dûr dibû. Em çûn malê. Dilê min leyistik nedixwest. Diya Şivan ji me re dîsa xwarin çêkiribû. Lê xwarin di qirika min de derbas nedibû. Belkî jı ev xwarin, xwarina me ya dawî bû... Min di nav xwarinê de şiklê mayina didît. Ha teqiyan, ha teqiyan... Tu tişt nagihîje tirsê. Tirs Melkemot e, Ezrail e, mirin e. Tirs mar e, dûbişk e, esker e...

Di nav me de ê ku bi kêf û şa bû, xwişka min Bêrivan bû. Dikeniya, tinaza dikir, dileyist. Ji her tiştî bê guman bû. Baran û Ferho ji tirsa ketibûn xewê.

Piştî xwarinê, Apê min Temo gote me ;

- Hun gele razên. Hîv dereng diçe ava. Wext hê zû ye.

Lê ji tirsa xew nediket çavên min. Ez di nav livînên xwe de digevizîm. Tirs ketibû dilê min û tinazê xwe bi min dikir. Şewqa Hîvê dabû pencera odê û hîv li min mêze dikir. Min di ruyê wê de panzaran, mayinan, qereqolan û eskeran didît...

Institut kurde de Paris

- Zû kin, Apê min gote me. Dem derbas dibe. Kincên xwe li xwe kin û derên derve !..

Em derketin û çûn pişta xanî. Hîv çûbû ava, asîman çik sayî bû. Bi milyonan stêrk ketibûn govendê û diçirisîn. Şewqa eletirikên Serêkaniyê xwe direjî stêrkan kiribûn û diçilwilîn. Jor û jêr gihiştibûn hev.

Xalê Temo û çend hevalên wî rextên xwe girêdabûn û dipeyivin. Me ji hevalên xwe xatir xwest. Hevalên me di nav taritiyê de zû winda bûn. Çûyina wan, dilê min tijî keser kir. Axînî ji min çû... Eva serê deh rojan bû ku em bi hev re bûn. Em pirr hînê hevdû bûbûn. Xwezî em ji hevdû neqetiyan. Lê heta îro kî bi xweziyan gihiştibû mirad û armancên xwe, ku ez bigihiştima.

Piştî çûyina hevalan qedera me ketibû destê qaçaxçiyan. Hevalên me nedixwestin ji Kurdistanê dûr bikevin. Barê wan giran bû...

Em bi rê ketin. Xwişka min Bêrivan raza bû. Yekî qaçaxçî wê xiste nava egalekî û da pişta xwe.

Em qederek meşiyan. Taritî wek perdeke reş xwe berdabû ser Deşta Heranê. Şev dereng bû. Me berê xwe dabû Pira Selatê ; pira tûj û zirav, wek devê şûrê...

Xalê Temo ketibû pêşî, wek xortekî çarde salî dipekiya. Carna xwe davêt erdê û gohên xwe mûç

dikir. Gohên Xalê Temo wek radarê dengan digirt. Em li gora raporên wî dimeşiyan.

Nêzê hidûd em sekinîn. Xalê Temo ji me re, bi dengekî nizim got :

- Têl ji me sê sed metro dûr in. Wê du kes ji me herin têlan bibirin û li ber eskeran bikevin nobetê. Gava esker bi me bihesin, ewê wana bidin ber tivingan, ku esker nikaribin serên xwe rakin û li me bidin.

Xalê Temo qaçaxçikî navdar bû. Melkemot jî, jê ditirsiya. Kezeba wî ji pola bû. Heya îro bi dehan esker kuştibû.

Piştî peyva Temo me da rê. Li ber têla me qulûzik da û em meşiyan. Em yeko yeko li pey hev rêz bûbûn. Xalê Temo ketibû pêşî û Apê min li pey me dihat. Li pişt Apo, pismamekî Temo bi sivnikê rêçên me xira dikir û berepaşkî dihat. Bo ku sibê esker nizanibin ku işev hinek kes derbasbûne. Nexwe wê serê gundiya biketa belayê.

Reveçûna me baş derbasdibû. Tirsa dilê min şikesti bû. Min pozê xwe dabû pozê Heranê û difikirim. Bîna Heranê ketibû pozê min.

Deşta Heranê...

Deşta bêav, deşta bêdar. Deşta xezebê, a germê, a kelyayi. Heran heya îro kê dîbû, kê nedibû... Heran sitran bû, çirok bû, efsane bû. Heran Nemrûd kiribû kevir, Xelîl İbrahim şewitandibû, derya çikandibû. Heran dîrok bû, jiyan bû, mêrxasî bû. Heran Xwişka heft bran bû. Ji hezar salan vir de pişta xwe dabû heft çiyan û jiyana xwe didomand. Heran mar bû, dûbişk bû, moz bû...

Institut kurde de Paris

Belê, Heran hêvî ye, yar e, dost e. Xwediyê soz û qerar e ; henûn û dilsoz e. Zû bi zû zarokên xwe teslim nake, nade dest. Gava pêwis be, Heran zarokên xwe dixe zikê xwe û diveşêre. Ji Xelîl İbrahım vir de ev tişt bûye namûs, bûye irf û adet jê re. Çaxê quweta wê nagihîje dijmin, zarokên xwe teslimê birayên xwe dike. Brayên wê çiya ne, şax in, zinar in. Çavên wan tim li ser xwişka wan e û wê diparêzin. Xwişka wan doz e, armanc e, welat e...

Ji Nemrûd û vir de, dijmin her dem xwestine ku Heranê pîs kin, bêrûmet kin, zarokên wê bikujin. Ji bo vê yekê, Heran îro mayin e, dînamêt e, qereqol e. Lê dîsa jî, dayka me ya hezar salî dev ji me bernade û me nade dest. Heran xwişk e, bra ye, evîn e...

Ez bi dengê eskeran veciniqîm. Fikrên min belawela bûn. Heran bû wek marekî reş û di bin min de lepitî. Deng ji nêz ve dihat. Ji nişka ve çavên panzerê jî xwiya kirin. Heran ji gumeguma wê dihejiya. Alav ji devê wê dibariya. Perda tiritiyê qelişî, Heran şewq da. Em sekinin. Dawiya me hatibû. Min serê xwe danî ser dilê Heranê û xwe avêt torûbextê wê. Panzer nêze me sekini. Em li erdê melisîn. Dengê eskeran dihat me. Ez tu caran ji dengê merivan hewqas netirsiyabûm. Diranên min lihevdû diketin...

Piştî deh deqan panzer ziviri û çû. Em ev car jî, ji lepê Melkemot xilas bûbûn. Ger panzer çavên xwe li milê çepê biziviranda yek ji me nedifiliti. Em vêga kuştî bûn. Dengê panzerê ketibû mejiyê

Institut kurde de Paris

min û gumînî dikir. Mixê serê min tevlehev bûbû.

Em gihîştibûn mayina. Me şopa Temo taqîp dikir. Şaşiyeke piçûk dibû sedema mirina me teva. Ji nedîve xwişka min Bêrivan şiyar bû û dest bi girınê kir. Dengê girîna wê çû eskeran. Esker dest bi teqandinê kirin. Fişekên rengîn wek brûskan dinya ronahî dikirin û ser me de difiriyan. Qaçaxçiyên ku li ber wan ketibûn kozikan, bera wan dan û me diparêstên. Gurmînî bi Heranê ketibû. Çaralî me gullebaran dikirin. Em di nav tozûtelazê de mabûn, ax di ser me de dibariya. Deng ji Bêrivanê hatibû birrîn. Diya min di nav vê cehenemê de xwe avêt pişta qaçaxçî û xwişka min jê stand. Dadê êdî hizra xwe û mayinan nedikir. Xwe ji Bêrivanê re kiribû sîper û bazdida. Panzer çavên xwe xistibû zikê Heranê û şewq dida.

Em di bin gullebaranê de derbasî wuyalî bûn. Eskeran berê otomatikan dabûn me û diqîriyan. Fişekên wan li ber me, pişt me, nezî me diketin û dipekiyan. Bi hezaran fişek zikê Heranê dabûn ber xwe û wê kiribûn wek seradê...

Em ketin qortekî. Fişek ser me de derbas dibûn. Ciyê me baş bû. Ji tirsa, di ruyê min de reng nemabû. Ziqeziqa diranên min bû. Dadê destmala xwe xistibû devê min. Şev tarî bû û me hev zor didît.

Ji nişka ve qîjînî ji diya min çû :

- Ka Azad, ka Azad ?

Belê, Azad ne bi me re bû. Belki jî Azad hatibû kuştin ? Min jî dest bi girînê kir. Zarokbûna Azad di ber çavên min de derbas bû. Agir ketibû dilê



Institut kurde de Paris

min.

Apê min û Xalê Gundî serdevkî xwe nêzî hidûd kirin. Dengê tivingan sekinî bû. Diya min porê xwe dikişand û lawo, lawo dikir, xwe li erdê dida û bûbû term.

Piştî çarîkî Apê min û Xalê Gundî zivirîn. Azad jı bi wan re bû. Apê min keniya û got :

- Azad di têlan de daleqayî mabû. Dikir, nedikir, nikaribû xwe ji têlan xilas bike. Xwedê wî daye xatirê diya wî. Ger esker pê bihesiyana ew vêga kuştî bû...

Dadê xwe avêt ser Azad, devê xwe xiste gurçika ruyê wî û tê mijiya. Fişşefiş bi Azad ketibû. Hiqehiqa wî nedisekinî.

Belê, em ev car jî, ji lepên Melkekot xilas bûbûn. Belkî jî gunehê fişekan bi me hatibû. An jî Melkemot bi fişekên eskeran can dabû...

Lê çawa min ji we re got, Heran zû bi zû zarokên xwe nade kuştin û wan nade dest. Heran dê ye... Diya me Kurda ye.

Em bi rê ketin. Serêkaniyê ketibû xewê. Carna dengê pizpizkên bekçiyan dihat me. Em ji tirsa bekçiyan nawal nawal diçûn. Bo ku em bê pasepoart ketibûn Suriyê. Hasilî tehlike tim bi me re bû.

Em rût mabûn. Qaçaxçiya, ji tirsa xwe, eşyayê me avêtibûn nav mayinan. Em bê war, bêkes û bê tişt mabûn.

Em ji Serêkaniyê dûr bûn û ketin rêkî piçûk. Dinya li ber gewrbûnê bû. Bayê sibê qirş û toza rê kom dikir û davêt ser me. Dev û pozê me tijî xwelî

Institut kurde de Paris

bûbû. Ji dûr ve xênî xwiyanî kirin. Bi nêzîkbûna gund re, dengê kuçikan bilind bû. Kuçik bi çargavkî hicûmê me kirin dihewtiyan. Lê ez ji wan neditirsiyam. Min zanibû ku kuçik wek eskerên Tirkan ne har in. Xalê Gundî deng li kuçikan kir û kevirekî avête wan. Kûçik, Xalê Gundî pê re pê re nas kirin û dûvên xwe xistin nava lingên xwe û bi alê gund de bazdan. Ne meriv tenê, kûçik jî, ji Xalê Gundî ditirsiyan...

A Rastî, jiyana Xalê Gundî, ne tu jiyan bû. Hewqas tehlûke ji bona çend quruş pere bû. Guneyê min pê dihat. Îro nebe sibê ewê jî wek kalê xwe, wek pismamên xwe bihata kuştin, an jî di nav mayinan de wê bata perçe kirin.

Em ketin nava gund. Dîka bang dida. Em li ber xanikî sekinîn. Xalê Gundî li derî da. Yekî bejin dirêj, çav reş, por guzwan, li me derî vekir. Ew bavo bi xwe bû... Ken ji ruyê bavo dibariya. Bavo çenga xwe vekir û got :

- Piştî hewqas tadeyî û lêdanê, em dîsa gihiştin hev... Hun bi xêr û selamet hatin.

Me xwe avêt çenga bavo û giriyan. Diya min li erdê rûnişt û serê xwe xist nava destê xwe û wek heykelek sekinî. Bavo dixwest ku me teva têxe dilê xwe û veşêre. Bêrivan xwe li bavo danetanî. Ji bo ku, wê bavo nasnedikir. Bavo jê re xerîb bû. Yê ku di nav me de nedigiriya, Bêrivan bû...

Institut kurde de Paris

## BİNÊ XETÊ

Em li malake naskirî diman. Xwediyê malê dostê bavo bû û şoreşgerekî Kurd bû. Navê wî Welat bû. Apê Welat pirr cara diçû Kurdistana Tirkiyê û dihat. Ew jî di partiya bavo de bû. Hal û wextê wî li cî bû. Zarokên wî, yên mezin, hinek ji wan li Helebê, hinek jı li Qamişlo dixebitîn. Apê Welat, zarokên xwe bi welatparêzî mezin kiribû.

Wek her malekî Kurdistanê, mala wî jî pirr qelebalix bû. Neh zarokên wî hebûn. Ya piçûk şeş salî bû.

Em zû hinê mala Apê Welat bûn. Ji me kiri ku em dîsa li gundê xwe yê kevin bûn. Tiştek nehatibû gohirandin. Gundiyê Kurdistanê li hevdû çûne. Keça Apê Welat, Delal, ji min re wek Emo dihat. Di navbera wan de firqeke mezin tune bû. Me ji hevdû zû hes kir û em bûn hevalên hev.

Rojekî bavo, me teva civand û got ;

- Emê îro sibê herin welatekî din. Ez dixwazim hun ji vê gavê ve bizanibin. Em bi direjî nikarin li vî gundî bimînin. Ger hikûmeta Suriyê bi me bihese, dibe ku me teslimê Tirkiye bike. Ji bo vê yekê em gere haziriya xwe û çûyinê bikin.

Bavo hinek keniya û dom kir ;

- Zarokên wî welatî, ne bi zmanê me, ne jî bi lêstekên me dizanin. Ji bo vê, ez dixwazim ku hun qiymeta van rojan bizanibin û li gora dilê xwe bilê-

Institut kurde de Paris

zin, bipeyivin û bijîn. Ev rojên ha edî bi dirêjiya salan nakeve destê we. Emê dûr biçin...

Em ser peyvên bavo hewqas nesekinîn. Me gotinên wî zû ji bîr kir. Gunê me pê dihat. Bavo zaf kişandibû. Xazên kûl û derdan di nava ruyê wî de qermiçî bûn. Ji bona vê yekê, bavo çi bigota me digot, "Belê."

Bavo ji me re pirr tiştên entîke û xweşik anîbû. Trembêl bi xwe hereket dikir. Lê ya ecêptirın bûkik bû. Gava meriv wê ba dida, bûkik bi serê xwe digeriya, dipeyivî û sitrana digot. Ne em tenê, zarokên Apê Welat û yên gundiyan jî ketibûn heyretê. Gava bûkik çavên xwe diniqand, zarokên piçûk jê ditirsiyan û dest bi girînê dikirin. Bûkik bûbû bûka gund. Bûka çav reş, gerden sipî û bejin zirav nav û deng dabû. Ne em tenê, jin, mêr, pîr û dapîr jî pê dileyistin.

Lê dîsa jî gundê me yê kevin ji bîra min nediçû. Carna hinek dengbêjên me diketin bîra min. Kizînî bi dilê min diket û ez difikirim. Bavo ji wan dengbêjan pirr hes dikir. Çaxê em li gund bûn, bavo dengbêjên binav û deng dawetê malê dikir û bi seetan gohên xwe dida wan. Heyecaneke mezin bi bavo digirt. Bavo radibû piya û di nav odê de diçû dihat. Wan sitranan yeko yeko dixist teybê û qaseta vedişart. Hinek ji wan sitranan li ser şerê Kurd û Tirkan hatibûn gotin. Hinek jî ên dilan bûn. Ez navê Binêxetê ji wan sitranan fêr bûbûm. Di hinek sitranan de derbasdibû, ewên ku li ber hikûmeta Tirkan serê xwe hildane û xwestine ku ordiya Tirkan ji Kurdistanê bavêjin, pirr caran Binxet

Institut kurde de Paris

bûne.

Bavê min çîroka Binêxetê ji me re gotibû. Şêst sal berê, Fransa ketibû perça Kurdistana Suriyê. İngiliz jî ketibûn Kurdistana İraqê. Ev her dû dewlet bi serekên Tirkan re bûbûn yek û Kurdistanê di nav xwe de par kiribûn. Petrola Kurdistanê ketibû destê İngilizan. Perçê mezin jî dabûn Tirkan. Di wî wextê de Osmanî û Alman xeteke trênê di vî mintiqê de çêkiribûn. Serxet û binxet navê xwe ji vî xeta hesinî standibû. Suriye piştê wê demê ketibû bin hikmê Fransa û xelqê jê re digot Xeta Fransa...

Lê bi gotinan tişt zû bi zû nakevin serê yekî. Gere meriv tiştan bi çavan bibîne. Ya rastî, heta em nehatibûn vir, gotinên bavo neketibûn serê min. Lê vê gavê her tişt li ber çavên min bû. Belê, Kurdistan hatibû par kirin û em bi hidûdan ji hev qetiyabûn. Ev çar dewletên ku Kurdistanê di nav xwe de par kirine, nahêlin ku Kurd bi hev re bidin û bistînin.

Ji bo vê yekê jiyana Kurdan li vir jı wek ya Kurdistana Tirkiyê nebaş bû. Li vir jî zmanê me qedexe bû. Hikûmeta Suriyê gelê me, wek Kurd nasnake û tabiiyet nade wan. Îro bi sed hezaran Kurd qaçax dijîn û xwe ji polîsên Suriyê vedişêrin. Pirraniya wan birçî û belengaz in. Mafê wan yên insanî tune ye. Her tim tên perçiqandin. Bi kurtî, ew jî wek perçên din esîr in...

Li gund dibistan hebû. Ew jî wek dibistana gundê me, ji betonê hatibû çêkirin. Mamoste Kurd bû. Lê newêribû dersê Kurdî bida. Zarokên vir li

dibistanê bi erebî ders didîtin. Elifbaya wan, wek yê jina mele bû. Gava zarokan ji min re dixwendin û nişanên min didan min jê tiştek fêm nedikir. Li Tirkiyê, bi elifba latinî me dikin Tirk, li vir bi elifba erebî zarokên Kurdan dikin Ereb. Ya pîstir, ez û hevalên xwe, me nikaribû ji hev re name bişanda. Bo ku zarokên vir nikaribûn bi latînî binivisandina.

Mala ku em lê diman bi televizyon bû. Evaran me tim li televizyona Tirkıyê mêze dikir. Bo ku me ji televizyona Suriyê tiştek fêm nedikir. Proxramên Tirkiyê tim behsa teroristan û ya Kurda dikir. En dihatin girtin û diketin nava lepên wan, derdixistin televizyonê û wana teşhir dikirin. Tim digotin ku, me îro hewqas terorist û kurtçî girtiye, hewqas çek daye hev... Me hewqas jî, ji wan kuştiye. Kes êdî nikare di hidûdê Suriyê de derbas bibe. Me bi deh hezaran esker xistiye hidûdan û riyan girtiye. Lo hasili çi tê bîra we wisa digotin. Li gora wan, ordiya wan di dinê de yekem bû. Eskerên wan şêr bûn,piling bûn... Carna jî afîşan nişan didan. Di afîşan de resmê welatparêzên Kurdistanê çap kirîbûn. Televizyon di proxramên xwe de ji xelqê re digot ku, yên van xayinan, qatilan teslîm bike, ewê bên mukafat kirin. Hikûmet yê mal û milk bide wan. Lê, ewê ku wan diveşêrin û xwedî dikin, yên bên girtin û belki jî idam kirin. Wisa xwiya bû ku, ji xwe pirr ditirsiyan. Taya mirinê ketibû çavên wan û ji xwe direviyan. Wan baş dizanibû ku, îro bi deh hezaran gelê me li dijî wan bû û li ber firseta xwe bûn. Îro nebe

Institut kurde de Paris

sibê, ewê serê xwe rakin û wê bibin Melkemotê wan... Televizyon çend cara resmê bavo jî nişan da. Cunta serê bavo dixwest. Bavo bûbû sitrîn û katibû nava çavên generalan...

Bi şev pirr caran xew nediket çavên min. Gurmîna tivingan, dengê panzer û mayinan xêniyên gund dihejandin. Gund nêzî hidûd bû. Dengê otomatikan dibû wek dengê guran û diket mejiyê min û diteqiyan. Min ji şevên hîvînî nefret dikir. Ruyê generalên Tirkan ketibû nava hîvê. Jiyana me yê kevin, di ruyê hîvê de çikiya bû. Mar û dûbişk, heliqopter û panzer ji hîvê dibariyan. Ka ev hîva beriqî, ewê dîsa mala kî xira bike işev ?

A rastî em li vir jî ne di emniyetê de bûn. Beriya çend mehan qomandoyên Tirk derbasî viyalî bûbûn û avêtibûn ser gundekî Qamişlo. Wê şevê tam panzde Kurdên ji Kurdistana Tirkiyê hatibûn kuştin. Zarok, jin, pîr hasilî kî ketibû ber wan, sax bernedabûn. Qetliama gundê Qamişlo bûbû agir, bûbû pizot û ketibû dilên Kurdên Kurdistana Suriyê... Generalên Tirkan êdî hidûdan nas ne dikirin. Çavên wan tijî xwîn û kîn bûbû. Hebûna Kurdan dilê wan dêşand. Bûbûn İzrailê gelê me û çekên xwe yên nû di me de diceribandin. Ji xwîna me têr nedibûn. Devên xwe xistibûn birîna me û tê dimijiyan...

Piştî wê hedisê gundî bi şev nobet digirtin. Pirraniya wan xwedî çek bûn û xwe diparêstin. Hikûmeta Suriyê di binî de bi generalên Tirkan ve dan û standin dikir. Dengê xwe ji wan re dernedixist. Eskerên Tirkan bi kêfa dilê xwe hereket dikirin.

Institut kurde de Paris

Herdû aliyê hidûd jî di bin qontrola wan de bûn.

Li gund bi dehan ailên ku ji Kurdistana Tirkiyê reviyabûn, diman. Weziyeta wan gelek xirab bû û bi şîva şevê ketibûn. Zarokên wan zaf cara birçî, nexweş û jar bûn. Zarok her roj diçûn Serêkaniyê û ava sar, meşrubat, pakêtê cixaran ji xwe re difirotin û alikariya malê dikirin. Gundî çi ji wan dihat texsir nedikirin. Lê ew jí feqir û belengaz bûn. Jiyana wan bi qaçaxiyê derbasdibû. Heta îro ji her malekî yek, an jî dido ser hidûdan hatibûn kuştin û seqet kirin.

Kurdên ku ji Kurdistana Tirkiyê hatibûn pirr dikişandin. Ji wan keçikan yek jê Roza bû. Roza ji gundekî Diyarbekirê bû. Bavê Roza jî wek bavê min welatparêz bû û esker lê digeriyan. Beriya çend mehan, bavê Roza zarokên xwe derbasê vir kiribû û dabû çekê xwe û derketibû serê çiya. Çûyin ew çûyin bû. Heta niha tu kes xeber jê negirtibû. Dibû ku hatibû kuştin, an jî girtin. Weziyeta wan ne baş bû. Gundiya xêra xwe xwarin didan wan. Diya Roza ji kerba dilê xwe dernediket derve û tim digirîya. Çar zarokên piçûk mabûn di stûyê wê de.

Rojekî Roza hate mala me. Li erdê runişt, serê xwe xiste ber xwe û ponijî. Bavê min çû balê, bi destê wê girt, serê wê hilda. Roza çavên xwe ji çavên bavo revand û li min mêze kir. Bavo destê wê hejand û bi dilekî evînî jê re got ;

- Ka bêje keça min Roza, ma derdekî te heye ?

- Na, sipas mamoste, Roza gote bavo. Ma wê çi derdê min hebe ?

Institut kurde de Paris

- Na na, bavê min got. Ez dizanim ku tu naxwazî ji min re derdê xwe bêjî. Hadî şerm neke û bêje.

- Hema tu sax bî, mamoste. Ma ezê çi bêjim.

Bavo hinek xwe sert kir û destê wê givaşt.

- Ez jî bavê teme lawo. Ma ji min re firqa te û Hêlîn çi ye ? De bêje keça min.

Roza dest bi girînê kir û xwest ku biçe. Lê bavo wê berneda û sitêrkên wê bi destmala xwe paqij kir. Dawî Roza daxwaza xwe got :

- Mamoste, em zaf perişan in. Diya min ji te rica dike, ku tu karibî hinek pere bi deyn bidî me. Ez dixwazim bi roj biçim Serêkaniyê û cixaran bififroşim.

Axînî ji bavo çû. Kuxukeke sert û pîs kete qirika bavo. Çavên bavo sor bûn. Bavo kulma xwe şidand, tif kire erdê.

- Megrî Roza, bavo got. Dawiya tengasiye firehi ye. Piştî ku ez zarokên xwe bi cî bikim, ezê jî herim ba bavê te. Em welatê xwe, namûs û diroka xwe zû bi zû bê kuştin ji generalên Tirkan re bernadin. Fermo keça min, van peran bigire û here malê. Ev perê han ne bi deyn in. Rojekî gava em zivirîn Kurdistanê, ezê ji bavê te bistînim. Lê îro em ne deyndarê hev in.

Roza bi roj diçû bajêr û cixaran difirot, evarkî diziviri gund û îdara malê dikir. Roza keçikeke pirr delal, xweşik û baş bû. Îsal ketibû sala sêzda. Lê feqîrtî pişta Roza şikandibû. Quweta feqîrtiyê tenê negihiştibû çav û biruyên Roza...

Du mehên me qediyabû. Payîz ji serê çiyan xwe hêdî hêdî berjêrî Deşta Heranê dikir. Bayê nerm

Institut kurde de Paris

û honik mizgîniya payizê dida me. Roj bi roj ruyê Heranê zer dibû, Heran dikete tayê. Xetên sor, qahweyî û reş xwe li çavên Heranê didan. Heran dinaliya, Heran li ber girînê bû...

Institut kurde de Paris

# EM RÊWI NE

Jiyana me baş derbasdibû. Dadê roj bi roj kêfxweş û rûken dibû. Jinên gundiya jê pirr hes dikirin.

Roj zû diçûn. Gul û pîvokên Deşta Heranê yeko yeko winda bûbûn. Bihara xemilî mala xwe ji deştê bar kiribû û berê xwe dabû xurbetê. Bihar çûbû, lê dîsa jî bîna gul û kulîlkan, rîhanan ji pozê min dernediket.

Bavo carna winda dibû û bi rojan nedihat malê. Lê wek berê, em ji tunebûna bavo nedirtisiyan. Bavo ji eskerên Tirka dûr bû. Destê wan nedigihiştê.

Em bûbûn perçekî ji gund. Ji vir çûyin qet nediket bîra me. Ji me kiri ku emê tim li vir bijîn. Lê rojekî bavo hate mal û ji me re got :

- Emê sibê ji vir herin. Hun gele îro haziriya xwe bikin. Şansê me baş diçe.

Peyvên bavo, ez tirsandim. Dilê min li hev ket û ez di ciyê xwe de mam. Min nedixwest ku em ji vî gundî biçin. Em û zarokên gundiya bûbûn wek xwişk û bira ji kev re. Ma çima gelo emê dev ji wan berdin û herin welatekî din. Ji bo vê yekê, min ji bavê xwe re got :

- Hun herin. Lê ez naxwazim bi were bêm. Ez terka Roza û zarokan nadim. Ez û Roza, emê ji xwe re cixaran bifiroşin û jiyana xwe

Institut kurde de Paris

bidomînin. Em bi te re ketine belayê. Ger tu dixwazî ji vir herî, fermo riya te vekirî ye. Hikûmeta Tirkan serê te dixwaze, ne ê me...

Gotinên min li xweşê Azad neçûn.

- Bavo, Azad got. Hêlîn dîn bûye. Aqlê xwe xwariye. A baştir ew e ku, em wê li vir bihêlin û herin.

Azad, Ferho û Baran bihistibûn ku bavo li balefirê siwar bûye û emê jı têkevin balefirê. Ji bona vê, wan dixwest ku em rojekê zû ji vir herin û bifiri.

Azad nesekini û bela xwe li min da :

- Tu tiştekî nizanî Hêlın, Azad gote min. Tu naxwazî tiştên xweşik û rindik bibinî. Daxwaziya te gevezetiya neve gund e. Em ji leqeleqa te kerixîne.

Peyvên Azad kela min rakiribû. Min quncirikekî li qorika wî da û ez qîriyam :

- Ez wek te ne ehmeq im, Azad, min gotê. Ez ji te çêtir fêm dikim reben. Ez dizanim wê çi bê serê me, li welatê xerib û xurbetê. Ji te kiri ku emê bikevin balefirê û balefir ê tim li hewa bimîne. Kuro malmîrat, ji bîra xwe nebe, gava em ji vî gundî herin, em êdî nikarin paş de bizivirin. Dîtina me û van insanan, wê bimîne roja qiyametê. Xalê Roza beriya çend salan ji Kurdistanê derketiye û çûye welatekî din. Çûyin ew çûyin. Ji wê rojê heta îro çavên kesî pê neketi ye...

Azad wekî her cara, gohê xwe nedida min.

Belê, emê sibê ji vir biçûna. Daxwaziya min

Institut kurde de Paris

nikaribû tişteki bigoharta. Zarok sitûxwar in, reben in. Dê û bavên wan bi ku de biçin, ew mecbûr in bidin pey wan. Wek mesela çûçik û qepikan...

Bavo ji peyvên min pirr dêşiya. Reng li bavo nemabû. Bavo simbêlê xwe dixist ber diranên xwe û gez dikir. Çavên wî tijî bûbûn. Li min zivirî û got :

- Tiştên wisa nebêje keça min. Helbet emê rojekê bizivirin welatê xwe. Lê çi feyde keça min, em di rewşa îro de mecburê çûyinê ne. Ez li vir nikarim tu karî bikim. Perê me li ber xilas bûnê ne. Hikûmeta Suriyê dikare me teslîmê Tirkiyê bike. Hun li vir nikarin herin dibistanê. Lê ez soz didim we Hêlîn, emê rojekî bi serfirazî û bi dilxweşî biçin Kurdistanê. Ji bîr nekin, dem zû tên gohartin.

Bavo jî zanibû ku zivirandina me hewqas ne rehet bû. Lê dîsa jî bavo dixwest ku wek dilê xwe bipeyive.

Diya min dest bi girînê kiribû. Sitêrkên min jî dibariyan. Bavo lêvên xwe gez dikir, cixare ser cixarê dida û çêra dikir. Sitêrkên me bûbûn wek pizotekî agir û ketibû dilê bavo. Birînên me ji nû ve xwîn dibûn û qaşilên xwe davêtin.

Ez derketim derve û çûm nava gund.

Roj li ber ava bûnê bû. Şewqa rojê rengekî bi zer û sorînî xistibû ruyê Heranê. Sibê, ez û Heran, ez û çiyan, me yê hevdû winda bikira. Min bi dilekî şikestî, bi stûyê xwar, ji Heranê, ji çiyan, ji rojê xatir xwest. Roj hêdî hêdî li ber ça-

Institut kurde de Paris

vên min winda bû. Şûşa dilê min şikest, ava navê rijiya... " Bi xatirê te welatê min... Diyarê bav û kalan. Heta ez sax bim li dinê, tê tim di dilê min de bî... "

Min hêstirên xwe paqij kir û çûm mala Roza, ji bo xatir xwestinê.

- Me ji bîr nekin, diya Roza gote min. Xweziya min bi we be.

Dotira rojê em ji gund veqetiyan. Hevalakî bavo me xiste teqsiya xwe û bir. Me tiştên xwe dabû gundiya. Tiştên lîstokên me, me dabû zarokên Apê Welat. Zarok ji kêfa difiriyan. Tu car nehatibû bîra wan, ku ewê rojek bibûna xwediyê van lîstokan. Hasilî, ji kincan bêtir me tiştek bi xwe re nebir.

Ji gund derketin hewqas ne rehet bû. Ji piçûkan heya mezinan, heya pîr û kalan, tev de li me civiyabûn. Em tev bi hev re digiriyan û me hevdû maçî dikir, xatir dixwest û dikesirîn...

Gava ku teqsî hereket kir, ez li pişt xwe zivirîm û min bi çavên xemgîr li gund qederek mêze kir. Kî dizane, belkî jî ev nêrandin, nêrandina dawî bû, ji bo min. Dîtina min û van deran, van kesan, bi bîrûbaweriya min êdî ne mimkin bû. Minê wana ji îro pê ve di resman de, di qertan de bidîta...

Bavo ji me re behsa welatê ku emê biçin kiribû. Bavo digot, ew welat pirr sar û pirr dûr e. Navê wî Swêd e. Bi rastî ji bo me ev nav zaf ecêb dihat. Me dikir nedikir, me nikaribû navê wî rast bigota.

Institut kurde de Paris

- Li wî welatî kes bi kurdî, an jî bi tirkî nizane û bi van zmanan napeyive, bavo digot. Lê peyvandina zmanê kurdî ne qedexe ye. Ger ku zarokên Kurdan bixwazin, dikarin herin sinifên kurdî û bi zmanê xwe dersê bibînin.

Bavo pirr pesnê wî welatê ji me re dida. Cenet jî li ber Swêd ne tiştek bû. Xasma gelê Swêd ji Kurdan zaf hes dikirin. Gelê Swêd dost û yarê gelên bindest bûn...

Peyvên bavo li xweşa me diçû. Lê a rastî, me ji bavo hewqas bawer nedikir. Bavo sirf ji bona dilê me van tiştan digot herhal... Ka em mêze kin, ku em nemirin, emê her tiştî bi çavên xwe bibînin û baweriya xwe bêjin. Wext hê zû ye.

Ji me kiri ku emê bi trênê herin Şamê. Ev cara yekemîn bû ku emê biketine trênê. Azad ji kêfa difiriya. Azad, gundiyan, zarokan zû ve ji bîr kiribû û ketibû xeyala trênê. Lê Apê şifêr me li ber meydana balefirê peya kir. Bavo keniya û got :

- Emê bi balefirê herin Şamê. Balefir çêtir e.

- Ez bi balefirê naçim, diya min gote bavo. Ez jê ditirsim. Ka te bi min re soz dabû ku emê bi trênê biçûna Şamê. Tu çima min dixapîni ?

Azad û Ferho ji kêfa balafirê devê xwe qiç kiribûn û li dadê mêze dikirin.

- Emê bikevin balefirê... Bijî bavo, digotin û kêf dikirin. Bavo dadê xapandibû. Bavo nexwestibû jê re li gund rastiyê bêje.

- Şeva çûyî min nexwest ez ji te re rastiyê



Institut kurde de Paris

bêjim, bavo gote dadê. Lê ya rastî, em mecbûrê balefirê ne. Trên, otepos, an jî teqsî, ji bo me pirr tehlûke ye. Polisên Suriyê ji bîst kilometrê carek trembêlan oxilme dikin. Çawa tu dizanî, ne paseporta me heye, ne jî misada rûniştinê li Suriyê. Ger polis me bigire, wê me teslimê hikûmeta Tirkiyê bike. Lê ev tişt di balefirê de tune ye. Ji wan kiri ku merivên feqir, merivên qaçax û belengaz nikarin bi balefirê herin. Bo ku bilêtê balefirê pirr biha ye.

Dadê serê xwe xistibû ber xwe û gohdarî dikir. Gotinên bavo ketibûn serê wê. Bavo ji me teva rica kir û got.

- Gava em ketin meydanê gelek hun pirr bê deng bin û netirsin. Nexwe polis wê bi me bihesin û me bigirin. Kurdî peyvandin qedexe ye. Ger hun van tiştên ku ez ji we re dibêjim, bikin, emê bikaribin derbas bibin û xwe xelas bikin. Baş e ?

Em ji qontrola bilêtan derbas bûn û çûn bi alê balefirê ve. Deng ji me dernediket. Vir jî, wek hidûdê Tirkiyê ji bo me bi tehlûke bû. Hewa germ bû, roj ji erdê bîna ziftê radikir. Bineke zaf nexweş û pîs ketibû pozê min û ez li ber vereşandinê bûm. Dadê serê şarpa xwe xistibû devê xwe û dimeşiya. Em yeko yeko berjor bûn û ketin balefirê. Ez ji heyecanê dilerizim. Gulpina dilê min, qefesa singê min dêşand.

Balefir li esmên wek çivîkekî difiriya. Carna nizim dibû, perrên xwe berjêr dikir û teniştkî diçû. Ji tirsa, min newêribû li jêr mêze kim...

# Lİ ŞAMÊ

Em bi balefirê zû hatin Şamê. Weka ku meriv çavên xwe veke û bigire, ha me dî ku em li erdê ne. Eşeke pîs ketibû gohên min û ez kerr bûbûm. Deng ji zarokan dernediket. Dikirin, nedikirin ev hikmeta ha nediket serê wan. Ev tiştê hesinî, mezin û giran çawa difiriya ? Bi rastî ev tiştekî pirr ecêp bû. Pirraniya rewiyan bi kurdî dipeyivîn. Herhal ew jî wek me ji eskerên Tirkan direviyan û diçûn welatê din. Lê bavo nehişt em bi kesî re bipeyivin. Hasilî, em ji vî hidûdi jî bê tifaq derbas bûbûn. Şansê me baş lêxistibû.

Gava em derketin derve, trembêlek lêviya me bû. Di terembêlê de çend kes hebûn. Lê ew kes ne wek Ereb, Tirk an jî Kurdan bûn. Bi zmaneki din dipeyivîn. Bavo bersiva wan dida û serê xwe dihejand. Porên wan zerikî, çavên wan hêşîn bû. Min di jiyana xwe de tu car merivên wilo zirav û dirêj nedîtibû. Li ber çavên min wek minaran xwiyanî dikirin.

Em û wan hatin otêlê. Ji bo me, sê ode hatibû girtin. Ode bi tuwalet û hemam bûn. Li ser masan tiştekî reş hebû, bavo digot ew telefon e. Lê telefon çi ye, ji bona çi li ser masan bû, em tê nedigihiştin. Carna zirrinî dikir û em jê vedicirîqîn. Me newêribû destê xwe bidayê. Bavo tim



Institut kurde de Paris

bersiv dida. Ew çax em tev bi hev re dikeniyan. Ma ew tiştê piçûk çawa dikaribû bipeyiviya ? Herhal ji bona ku em bikenin, bavo tinazê xwe bi me dikir.

Em bi şev û roj diketin hemamê. Ava sar û germ ji mislixan dihat. Bavo tiştek dêxist nava avê, av kef dida. Û em di nav kefê de digevizîn, dişemitîn. Kêf kêfa me bû. Derd û kulên me di nava kefê de winda dibûn.

Li otelê liqonte jî hebû. Em her sibe, nîvro û êvaran diçûn jêr û me xwarin dixwar. Xwarina loqentê pirr bi lezet bû. Meriv jê têr nedibû. Jiyana me, ji jiyana axan û ji jiyana zabitên Tirkan jî xweştir bû. Me bi çavekî din li xwe mêze dikir. Em zaf qurre bûbûn.

Roj zû derbasdibûn. Seyra Şamê ji balqona otêlê seyreke pirr xweş bû. Bi hezaran trembêl, otepos diçûn û dihatin. Çeşit çeşit meriv, cade û soqaxan tijî dikirin û bi lez dimeşiyan. Xasma gava dibû êvar, Şam di nav şewqa eletrikan de dima. Minaran serên xwe dabûn esmên û Şamê dixemilandin. Ev dinya çiqas fire bû lo !.. Xaniyên mezin, piçûk, bilind, nizim pala xwe dabûn hevdû û bi rengîn bûn. Carna dengê pizpizkên polis û bekçiyan ji nav bajêr bilind dibû.

Carna ew merivên por zer dihatin ba me, şekiran û tiştên leyistikê didan me. Bavê min digot ku ev meriv ji Xaça Sor in. Bi rastı ji me re pirr baş bûn. Mesrefa me wan dida û me teva miayene kiribûn.

Rojek trembêlek hate ber otelê û em lê siwar

bûn. Şifêr me di nav Şamê de qederek gerand. Carna lembe sor dibûn, em disekinîn. Bavo digot ku, ger ne ji van lemban be wê trembêl li hevdû bikevin û wê rê bên girtin. Lê a rastî peyvên bavo nadiket serê me. Ma lembe çawa dikaribûn ji berxwe ve reng bigohartana ?

Em li ber xanikî zer û pirr delal sekinîn. Em çûn hûndir. Ew xanî Sefaretxana Swêd bû. Mamurên vê xaniyên jî por zer bûn. Wan ji me pirr hez kirin û şekiran dan me. Bavê min û yek ji wan, bi dirêjî bi hev re peyivîn.

Piştî çend seetan em dîsa bi trembêlê zivirin otêlê. Bavo bi çavekî evînî li me mêze dikir û dikeniya. Derd û kulên bavo di nav kêfa me de winda bûbû.

Hefteya me qediyabû. Rojek bavo hate ba me. Madûmirûsên wî nebaş bû.

- Hinek tiştên me ne temam in, bavo gote me. Bê izna min neçin derve. Çûyina me hê ne kifş e. Em her dem dikarin ji vir herin. Ji bona vê yekê hun gelek tim li ber çava bin.

Bavo pirr bi hêrs bûbû. Carna bi xwe re dipeyivî û diranên xwe li hev dixist. Tif dikir erdê, serê xwe dihejand. Lê me goh nedida bavo. Şam ji bo me dinyakî nû bû. Em di nava vê dinya nû de bûbûn wek çivîkan û difiriyan. Em her roj diçûn dikana û me ji xwe re şekir, leblebî, benîşt dikirî. Min ji xwe re eynik, toq û şe jî kirîbû. Toqên serê min di binê roja Şamê de diberiqin.

Rojek piştî nivro bavo me civand û got :

- Em Kurd in. Em ji zebaniyên cehenemê jı xiraptir in. Jiyan bûye sotikê agir û ketiye stûyê me. Em dikin nakin, em nikarin xwé ji vî agirî xilas bikin. Hikûmeta Suriyê dixwaze me teslimê Tirkiyê bike. Ji bo ku em bê paseport hatine vir. Li gora wan ev tişt bê qanunî ye. Xaça sor û Sefareta Swêd dikin nakin nikarin hikûmeta Suriyê razı bikin. An emê paseporta Tirkan nişanê wan bidin, an jî wê me teslim bikin...

- Emê çawa bikin ? dadê got û dest bi girînê kir. Ma suriye bi rewşa Kurdan nizane gelo ? Tirk kingê paseport didin me ? Xwezî ez û zarokên xwe di nav mayinan de bimirana û em neketana vî halê. Ma qiyamet hatiye serê me tenê. Xwedê, me daye ber xezeba xwe û li me nayê rehmê.

Em tev bi hev de giriyan. Bavo jî dest bi girînê kiribû. Me çi dikaribû bikira ? Ger me teslimê Tirkiyê bikin, em sax nafilitin. A çêtir ew e ku em xwe di balqona otêlê de bavêjin û intixar bikin. Bila trembêl û otepos li ser termên me de herin û werin. Belkî ew çax dilê hikûmeta Suriyê û Tirkiyê rehet bike...

Piştî wê rojê otel ji me re bûbû wek zîndanek. Dîwar, qeryole, mase û hemam li ber çavên me bûbûn wek lawiran û dihatin me. Bi rojan xwarin û vexwarin bi devê me neket. Em weka pezên li ber kêr, lêviya qedera xwe bûn. Şerqina kêrikên qesaban ji dûr ve dihat me...

Institut kurde de Paris

## HİDUD NAQEDİN

Rojek bavo winda bû. Dadê got ku bavo ser hinek tişta difikire. Em gere dengê xwe dernexin û rehet bisekinin.

Dinavberê de sê roj derbas bû. Ev sê rojê ha ji me re bûbûn wek hefteyan. Dem derbas nedibû. Roj di ciyê xwe de sekinîbûn. Em carna derdiketin balqonê û me trembêlan, merivan dijmart, ji bona ku dem zû derbas bibûya. Lê me xwe dixapand. Tiştekî ku bikaribûya agirê dilê me bitefanda tunebû. Melekê Mewtê dîsa li hawirdora me digeriya. Em di nav hebûn û tunebûnê de mabûn. Carna me hinek kesan dişiband bavo. Em kêfxweş dibûn û me mizgînî dida dadê. Lê kêfa me di dilê me de dima.

Roja çara piştî nîvro bavo derket hat.

- Her tiştê me temam e, bavo got. Zû kin û tiştan bidin hev. Em gere di nav çend deqan de ji vir herin.

Me eşyayê xwe zû da hev û em berjêrê otêlê bûn. Ber otelê teqsikî sekinî bû. Em ketin teqsiyê û me hereket kir. Em ji Şamê zû derketin. Me berê xwe dabû qûntara çiyakî. Rê xwarowiçko dibû, darûber newalan xemilandibûn. Xwişe xwuşa avê bineke xweş dixist pozê min. Di riya asfalt de teqsî baş dipekiya.

Institut kurde de Paris

Kulpina cixarên bavo me difetisand. Xalê şifêr jî, ji bavo ne kêmtir bû. Xalo merivekî navsere bû. Demançekî çardexwir li pişta wî girêdayî bû. Bi me re bi kurdî dipeyivî. Mêrekî ji xwe razî bû. Çi bihata devê wî ji hikûmeta Tirkan re digot. Kurdiya wî wek yê me bû. Herhal ew jî wek me ji Kurdistana Tirkîyê firar kiribû.

Ez nizanim di navberê de çiqas wext derbas bûbû, teqsî ji riya mezin veqetiya û kete rêkî pirr piçûk û bê asfalt. Tekerên teqsiyê carna li keviran diketin û em ji ciyê xwe dipekiyan, serên me li hevdû diketin. Kortikên mezin û kûr nedihiştin ku teqsî zû here. Piştî nîv seetekî em ji teqsîyê peya bûn. Xalê şifêr ji me xatir xwest û paş de zivirî. Me da pey bavo. Em di bin qûntara çiyakî bilind da bûn. Çokên min diqurifin, dêşiyan. Me bi zor xwe avêt binê darekî. Bavo tiştên sar da me. Em xayîs ketin. Gava ku me çavên xwe vekir, çar kesên çekdar li ba bavo runiştî bûn û li me mêze dikirin.

Bavo heta niha ji me re tiştek negotibû. Lê piştî van kesan bavo ji dadê re got :

- Emê îro herin Libnanê. Ji wir belkî em karibin xwe bavêjin Swêd. Ev hevalên ha jî Kurd in û ji Kurdistana Tirkiyê ne. Ew li vir talim dibinin û hînê çekan dibin. Heval wê me sax selim derbas bikin. Lê ev hidûd jî wek yên dinê bi tehlûke ye.

Gotina hidûd agir xiste dilê min. Min dest bi girînê kir. Ma gelo êdî hidûd naqedin ? Ev

Institut kurde de Paris

a çenda bû ?

- Bavo qurban, min got. Ketiye dilê min ku emê bên kuştin. A çêtir ew e ku em bizivirin gundê Serêkaniyê. Ez naxwazim herim Libnanê.

- Zmanê xwe hewqas dirêj meke Hêlîn, bavo gote min, bi dengekî sert û bilind. Em mecbûrê çûyinê ne. Ji bona me paşveçûyîn ne mimkin e. Ev hidûdê ha, ji hidûdê Tirkiyê çêtir e.

Em bi rê ketin û meşiyan. Tiştek ji destê min nedihat. Hiş û aqlê min tim li gundê Serêkaniyê bû. Lê em ji hevdû pirr dûr bûn vêga. Me ruyê xwe dabû welatên xerib û xurbetê û em diçûn. Em bûbûn wek lawiran, wek guran û bi çiyan ketibûn. Kurdistan li kur, Libnan li kur ? Ma hewqas jı dibe... Bavo digot, destê hikûmeta Tirkan pirr dirêj e. Meriv zû bi zû nikare xwe ji lepên wan xilas bike. Bavo rast digot. Em bi ku de biçûna, ew destê bi xwîn û bê oxir tim li pey me bû...

Berê êvarê em gihiştin serê çiyê. Me xwe di bin kevirek qirase de veşart. Bajarê Beyrûd pişta xwe dabû quntara çiyê, serê xwe xistibû Bahra Spî û diponijî. Me dest bi xwarinê kiribû, ji nişka ve dinya hejiya, şerqînî bi esmên ket. Dengê tanq û topan, balefiran. bomban me kerr kir. Alava agirê ser bajarê Beyrûdê de bilind dibû. Dumanekî reş erd û esmên kiribû wek qetran, wek ziftê. Bahra Spî bûbû wek cehenemê û dişewitî, alav jê radibû. Xêniyên mezin û bilind ser hev de tera dibûn, di nav toz û

Institut Kurde de Paris

dumanê de diman.

- Li beyrûdê herp heye, bavo got. İsraîl û Filistînî li hevdû dixin. Hev qelandin. Bi hezaran zarok, jin, mêr û xort hatine kuştin. Lê em gere netirsin. Feyda tirsê ji mirinê re tuneye. Heta îro tirs tu kesî ji mirinê xilas nekiriye, heta me xilas bike. A çêtir ew e ku em bi cesaret bin...

Bavo sekinî, li me mêze kir. Ji me deng derneket. Wahşeteke mezin û bê tarif li ber çavên me dihat leyistin. Car caran gulê topan li nêz me, diketin û diteqiyan. Em di nava dumanê de diman. Balefiran bi hezaran bomban davêtin newalan, çiyan, nava Beyrûdê û bi lez bilind dibûn. Me bi destê xwe mala xwe mîrat kiribû. Herkes ji herbê direviya, em diçûn ber bi herbê ve...

- Belê, bavê min got. İsraîl nîvê Libnanê işxal kiriye û dixwaze gelê Filistînê ji wir derxe. Filistînî jî wek me bê welat in. Welatê wan jî hatiye perçe kirin. Tu mafê wan yê insanî tuneye. Û a pîstir, hikûmeta Libnanê jî alikariya İsraîl dike û Filistîniya dikuje...

Em ji bin kevirê derketin û çûn binê dareke zeytûnê rûniştin. Peyvên bavo nediket serê min. Kurdistan, Tirkiye, Suriye, İsraîl, Libnan, Filistîn... Çi ne ev ? Kî van navan daniye ? Meriv ji hev çi dixwazin ?

Em li binê dara zeytûnê heta nîvê şevê man. Piştî nivê şevê deng ji silahan hate birrîn. Beyrûd di nav agirê de şeva xwe derbas dikir. Em

Institut kurde de Paris

ji binê darê rabûn û bi rê ketin. Em berjêr diçûn. Hevalên me ketibûn peşiya me û em kaş dibûn. Carna eskeran em disekinandin. Hevalên me kaxizekî nişanê wan didan û em derbasdibûn. Dinya reştarî bû. Eletirikê Beyrûdê tefiyayî bûn. Ji me pêve kes li ser cadan û soqaxan namabû. Li serê kuçan û di ciyê asê de merivên çekdar hebûn. Nivê bajêr di bin destê Filistîniya û çapên Libnanê de bû. Hevalên me wan dinasiyan.

Berê sibê em ketin xanikî. Em berjêrê qata jêr bûn. Di bin ronahiya çirayê de me ji xwe re cî çêkir. Bi dehan zarok, jin, pîr û kesên nexweş, xwe li erdê dirêj kiribûn û dinaliyan.

- Hun li vir ji xwe re istrehet bikin û razên, emê piştî çendekî werin û we ji vir bibin dereke din. Netirsin, hevalên me ji me re gotin û çûn.

Em zû ketin xewê. Ez nizanim em çiqas razabûn, ez bi dengê terqînê ji xew pekiyam. Xaniyê ku em tê de bûn dihejiya. Gurmîna topan bû. Maxzen tijî dûman bûbû, çav çavan nedidît. Qirika min dêşiya, ez li ber vereşandinê bûm. Hinek xwe li derî xistin û derketin derve. Min jî da pey wan. Gava em derketin derve, em ji tirsa lal bûn. Apartimana nêzî xaniyê me temamen hatibû xwarê. Balefirên İsraîl wê bombe kiribûn. Nale nala birîndaran ji binê axê û betonê bilind dibûn. Bi sedan kes hatibûn kuştin...

Em zivirın ciyê xwe. Bê nan, bê av, em du roj

Institut kurde de Paris

di ciyê xwe de man. Me tu xeber ji hevalên xwe negirt. Dibe ku hatibin kuştin, an jî birîndar kirin.

Dawîya dawî bavo neqedand û em derketin derve. Kuçe bi kuçe, xanî bi xanî em di bin agirê sor de derbas bûn û me xwe gihiştand Xaça Sor. Bi sedan xênî hatibûn bombe kirin. Cendekê merivan ser cadan mabûn û bineke pirr pîs ji wan dihat. Herkes bi derekî ve direviya. Tifo û kolera bajêr tehdîît dikir. Eskerên İsraîl roj bi roj nêzî me dibûn. İsraîl yên ku ji Tirkiyê, an jî ji Kurdistana Tirkiyê hatibûn vir, ew digirtin û teslîmê Enqere dikirin. Weziyeta me gellek xira bû û em di nav tehlikeke mezin de bûn. Çi biketa ber İsraîliya bombe dikirin û dikuştin...

Piştî heftekî em bi trembêla Xaça Sor çûn meydana balefirê. Taveke cehenemî pişta stûyê min dişewitand. Roj bûbû gule û ketibû devê tanqan û diteqiya...


Gava balefir bilind bû, min di pencêrê de li Beyrûdê mêze kir. Qirika min tijî bû, çavên min di hêstirkên min de xeriqin. Bi sedan zarokên piçûk, reben, bêkes û birçî di serê min de difirîyan.

Asîman çik sayî bû. Balefir wek teyrekî mezin perrên xwe vekiribû û bi lez xwe ji Beyrrûdê dûr dikir. Di bin me de Bahra Spî, di nav kefa xwe de digevizî. Tirêjên rojê ketibûn perrên balefirê û şewq didan. Teyra Bazbelek, çavên xwe li Hêlînekî nû digerand. Hêlînekî bi

Institut kurde de Paris

sitar, Hêlînekî bi hêvî...

## DUWAYI




Institut kurde de Paris

# PAŞGOTİN

Navê welatê me Kurdistan e. Bav û kelên me bi hezaran sal li Kurdistanê jıne û dijın. Çiyayên bilind yên bi dar û ber ; deştên fireh û hêşinahî ; çemên geş û berdar, bav û kalên me di zikên xwe de veşartine, wan ji xwe re xwedi dibînin. Kurdistan bi her tiştên xwe ve ; bûye mekan, bûye cîh, bûye dad û welat ji Kurdan re.

Lê Kurdistan îro sitû xwar e. Dijminê Kurdan ev dayka me ya hezar salî ji me sitandine û wê xistine bin destên xwe ; ew dîl kirine, ew sêwî kirine ; çiyayên wê xemgîr in, çemên wê reben, deştên wê bê kes...

Kurdistan diya Kurdan e. Bi milyonan, ev dayka me zarokan çê dike û navê wan datîne Kurd. Dayka me Kurdistan ji bo zarokên xwe an jî ji bo me pirr kişandiye û hêjî dikşîne. Ew şewitandine, ew dane ber topan, ew talan kirine û dikin jî. Lê dısa jî dayka me ya delal û dilsoz, dev ji me bernade, zarokên xwe navêje derve.

Kurdistan di Şerê Yekemîn de hate perçe kirin. Paşverû, kolîdar û kevneperestên cihanê çav berdabûn petrola Kurdistanê. Kurdistan kirin çar perçe û di nav : Tirkiyê, Iran, Irak û Suriyê de par kirin. Ev her çar welatên faşist, zorker

Institut kurde de Paris

û kolîdar, bi tanq û topên xwe, dixwazin ku Kurdan ji cihanê rakin. Zmanê me, dîroka me, bi kurtı her tiştên me hatiye qedexe kirin. Diya me Kurdistan di nav dest û piyên wan de maye. Her roj wê talan dikin, xwîna wê dimijin, zarokên wê dikujin...

Kurdistan ta sala 1923 welatekî azad bû. Lê piştî Cenga Yekemin, Kemal û faşistên Tirkan bi Ingiliz û Fransiya re bûn yek û Kurda xistin bin destên xwe.

Ji bo wê yekê Şêx Seîd di , 1925 an de li dijı van koloniyalistan şer kir. Bi deh hezaran Kurd hatin kuştin û Şêx Seîd şehîd ket. Piştî Şehîdê mezin li Dersimê, Seyîd Riza serê xwe rakir. Tirk bi kevneperestê cihanê re bûn yek û vê tevgerê jî vemirandin.

Lê agirê azadiyê û serxwebûnê natefe. Ê dîsa gulên Feqiyê Teyran geş, baxçeyên Seydayê Ehmedê Xanî şîn bibin...

Kurd wê bi destê zarokên Kurdistanê AZAD bibin...

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Zivistan zû derbas bû. Bihara xweş û geş dinê xemiland. Barana biharê mêrgan têr avî kir. Lehî gihîştin hev, zikê erdê qelaştin. Çi kete ber wan, bi xwe re birin. Berxik, karik, golik û pez bi kêfa dilê xwe çêriyan. Dinya kirasekî şîn li xwe kir. Di vî kirasê delal û nerm de deqên sor, zer, kesk, spî, hasilî hemî rengên ku tên bîra meriv, tê hebûn. Di nav wan rengan de ; çivîk, kivroşk, kûsî, beq, mar û lawirên dinê kêfa biharê derdixistin. Nêrgizên kofîxwar, newroz, binefş û beybûn ; newalan, mêrgan, çiyan, çeman dixemilandin. Gula palvedabûn ser nêrgizan ; şîlan û sosin, beybûn û alal ketibûn naziya...

Lê bihar bi dirêjî ber xwe neda. Havîn bi ser ve girt, kirasê wê yê deqdeqî şewitand. Genim zer bûn. Me firîkan kizirand di nav tendûran de. Palên gund dasûkên xwe ji kewara derxistin, devê dasû-

Institut Kurde de Paris
IKPLIV107751

Invandrarförlaget
ISBN 91-85242-86-1
ISSN 0349-8417